
# ROJA NÛ

*kovara huneri çandi û edebi*



## NAVEROK


Dı "Festivala Folklor û Koro ya Cihanê" da
Folklora Kurdi . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .3

Şêrko Bêkes Xelata Tucholsky wergırt . . . . . . . . . . . . .5

Dı 50 saliya xwe da Serhıldana Dersimê . . . . . . . . . . . . .7

Çend Çarin . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .13

Bıryarên Parlamentoya Ewrûpayê. . . . . . . . . . . . . . . .14

Lı ser kurdan cıvina Akademiya Protestan . . . . . . . . . .15

Edebiyata Kurdi ya klasiki – Nali. . . . . . . . . . . . . . . . .16

Gotınên Pêşiyan . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .18

Şervaneki bıçûk ê Vietnami . . . . . . . . . . . . . . . . . . .19

Jı nav edebiyata cihanê
İlya Ehrenburg . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .24

Dısekıne... Dısekıne . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .27

Quncıkê Zarokan . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .28

Jı Nav Weşanan. . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .30


هەولنامەی کتێب


Sal : 9
Hejmar: 61 İlon 1987

XWEDİ : KOMKAR - Swêd
BERPIRSİYAR : *Şêroyê BOTAN*
NAVNİŞAN : Döbelnsgatan 16 B
113 58 STOCKHOLM
TELEFON : *08/ 32 82 51*
HESAP NO : *PG. 458980 - 0*

UTGIVARE : *Svensk-Kurdiska Arbetar Föreningen*
ANSVARIG UTGIVARE : *Ş. BOTAN*
ADRESS : Döbelnsgatan 16 B
113 58 STOCKHOLM
TELEFON : *08 / 32 82 51*
PG : *458980 - 0*




## DI FESTİVALA FOLKLOR Û KORO YA CİHANÊ DA:

# FOLKLORA KURDİ

Dı navbera 29 û 31'ê Gulanê (1987) da lı bajarê Limburgê - lı Elmanya Federal, Festivala Folklor û Koro ya Cihanê bı navê "HARMONİ FESTİVAL" çêbû. Dı bernama festivalê da jı 32 welatan bı tevayi 8400 kes beşdar bû. Lı ser navê Kurdıstanê ji Koma Govendên Kurdi ya komela Kolnê (grêdayi KOMKAR) dı programê da ciyê xwe gırt. Koma folklorê 5 caran derkete ser dıkê (sehne) û jı cûre cûre hêlên Kurdıstanê govendên me nişan dan. Bı her listıkê ra naveroka wê ji, bı elmani û ingilizi hate pêşkêşkırın û folklora Kurdıstanê geleki bala temaşevanan kışand.

Televizyona Hessen, listıkên kurdi dı ci da (naklen) pêşkêşi gel kır.

Hukumeta Tırk vê carê ji xwast bı riya hukumeta Kohl, astengiyan derxe ber kurdan ku dı festivalê da ci nedıne wan. Lê vê carê ji Komita Amadekariya Festivalê lı ber stembariyên siyasi stuyê xwe xwar nekırın, prensib neavêtın bın piyan. Bê şık bı van kıryarên xwe, ew û hevalbendên wan bêtır rezil dıbın. Jı bo wan wısa lê hatiye ku tıfi jorê bıkın sımêl e, tıfi jêrê bıkın rû ye...

### JI RÊVEBIRÊN FESTİVALA HARMONİ SPASİ

Pışti çend rojan, Komita Amadekariya Festivalê bı navê "Festival İnformatıon" bultenek derxıst û lı ser KOMA FOLKLORA KURDISTANÊ nıvisek weşand. Dı vê nıvisê da weha tê gotın:

"Serfıraziya vê komê, wê bıkeve tarixa Festivala Harmoni. Em nıkarın têr spasi vê komê bıkın, ku bı qabiliyet û zirekiya xwe temaşevanan heyran hişt. Wek amadekarên festivalê, em xwe mecbûri eşkerekırına bûyerên festivalê dıbinın. Jı bo ku ev kom (koma Kurdıstan) beşdari festivalê nebe dorhêlên siyasi gelek caran stembari kırın... Hate gotın ku *Dı festivalê da beşdarbûna komek.weha, jı armanca festivalê ya "aşıti û dostayeti" yê ra ters dıkeve.* Lê me, tucar jı van stembariyan ra seri danani.

"Dıvê em viya ji bıdın xuyakırın: Al û amblema koma welatek yan ji geleki etnik jı me ra ters nakeve.Yên ku viya jı bo xwe wek provaqasyon dıbinın (lı vê derê hukumeta Tırk tê qestkırın. Pışti beşdarbûna koma KOMKARÊ, koma Tırkiyê xwe vekışand) mecala me yê alikariyê jı wan ra tune.

Carek dın ji, jı dıl û can spas. Jı bo me û temaşevanên me yadigara heri mezın, wê hevditına me yê careki dın be."

# Şêrko Bêkes
# Xelata Tucholsky(*) Wergırt

*"Ez vê xelatê wek pıştgıriyeki jı gelê Kurd ra qebûl dıkım."*




Foto: BENGT ARNE IGNELL

*Serokwezirê Swêd Carlsson xelatê dıde Şêrko Bêkes.*

Xelata Kurt Tucholsky ya isal gıhişte şa'ırê kurd Şêrko BÊKES.

Ev xelata ku jı aliyê PEN-Kluba swêdi tê dayin, heta nıha sê caran hatiye belavkırın. Berê careki Adam Zagajewski (Poloni) û cara duwemin Don Mattera (Afrika Başûr) ev xelata gırtıbûn.

Roja 14'ê Tebaxê, serokwezirê Swêd İngvar Carlsson bı destê xwe xelat pêşkêşi Şêrko Bêkes kır. Dı gotara xwe ya spaskırınê da Bêkes weha got:

"Ez vê xelatê wek pıştgıriyeki jı gelê Kurd ra qebûl dıkım.

İro 20 milyon kurd, lı ber çavê dunyayeke kerr û lal, bı surgûn û qetliaman tê zarandın. Gelê me hewceyi pıştgıriye ye, zordestiya lı ser gelê kurd gerek e bête protestokırın."

Dı qısedana xwe da wi lı ser rola edebiyatê ji weha got:

" Edebiyat bûye dengê aştiyê, evinê û hêviyê. Ew jı berê da bûye dengeki berxwedanê ê zelal û gurr, jı bo gelên bındest yên cihanê."

Roja 8'ê Tebaxê, lı Stockholmê jı bo Şêrko Bêkes cıvinek hat amadekırın. Nêzi 500 kesi dı cıvinê da beşdar bûn. Helbestvanê hêja jı guhdarên kurd ra çend helbestên xwe xwend.

Wergırtına vê xelatê jı aliyê şa'ıreki kurd, dı nav kurdan da şabûn û dılxweşike mezın peyda kır. Em vi şa'ırê me yê hêja bı dıleki germ û şa piroz dıkın û jê ra serfıraziyên nû daxwaz dıkın.

---

(*) *KURT TUCHOLSKY: Ev nıviskarê elman, dı sala 1930 de wek mıhacır hatiye Swêd û lı wır bı tenê û bêrûmet, jiyaneke nexweş derbas kıriye. Wi daxwaza hevwelatiya swêdi kıriye lê, nedanê. Dı sala 1935'an da wi xwe bı destê xwe kuştiye. Jı sala 1985'an vırda PEN-Kluba Swêdi lı ser navê wi hersal xelateki dıde nıviskareki mıhacır.*

■

## ŞÊRKO BÊKES


Şêrko BÊKES dı sala 1940'i da, lı Kurdıstana Iraqê, lı bajarê Suleymaniyê hatiye dunyayê. Jı malbateke xwenda û ronakbir e. Bavê wi Faik Bêkes dı edebiyata kurdi da naveki mezın û rûmetbılınd e.

Helbesta Şêrko Bêkes ya pêşin dı sala 1957'an da, dı rojnama "Jin" da hat weşandın. Jı sala 1968'an heta nuha 10 pırtûkên wi yên helbestan hatıne neşırkırın.

Pışti şıkestına şoreşa 1975'-an, ku hıngê bı hezaran kurd hatın kuştın, gund û bajarên kurdan hatın şewıtandın û wêrankırın, bı sedhezaran kurd hatın surgûnkırın, hıngê Şêrko Bêkes ji surgûni başûrê Iraqê kırın.

Şêrko Bêkes çawan şa'ıreki hosta, wısan ji şervaneki jêhati ye. Wi bı salan, lı serê çiyan bı gelê xwe ra, lı hember dıjmın şer kıriye, keda xwe xıstiye nav tevgera azadiyê.

Ew dı sazkırına Yekitiya Nıviskarên Kurd da ji beşdar bûye û bûye serwerê wê.



### GERANEWE

Şırinekem... Sıbey erom be cêt ehêlım
Rêgay dûri geraneweyi nasûr ekêlım
Axi xozgey yadgari kurt... hel ekêşım
Fırmêski dıl, le naw şewi pestma enêjım...
Erom berew, şari bê dıl, şari bê bahar!
Çawrê me, jûri tenyay dosti gırıftar
Çawrê me, mali bê tayi, çol û holê dıl...
Çawrê me, asoyi bê xor, temeni bê gul!
Çend rojê bûn wek pepûlê, kurt bû temenyan
Nesrinekem, mal awa bi, xewê bo diman!

Sulêmani 1968

### BÊ TO

Wek çûn asman, bê esterê yan bahar bê gul
Em kur ebê û ew cuwanemerg, eçête jêr gıl!
Bê çawi toş, çawi şi'rım kure û rênebin
Bi lêwi to, ezizekem, bahar û gul... çin!

ŞÊRKO BÊKES

# 50 SALİYA SERHILDANA DERSİMÊ

# I

*Wergerandın jı Riya Azadî, hejmar 106: DILSOZ*


Serhıldana Dersim dı sala 1937'an da destpê kır, ku dı dema Komara Tırkiyê da jı serhıldanên fıreh û mezın ya dawi bû. Burjûvaziya kolonyalist lı hember serhıldanên dın tewreki çawa nişan dabe, her wısa dı derheqa vê serhıldanê da ji eyni tewır nişan da, dev jı inkarkırına gelê Kurd berneda û rastiyan jı gel veşart. Burjûvazi, serhıldanê wek "bûyerek zabıtayi" nişan da û êrişên ordiyê ji wek "manevra" da xuyakırın, ku ev serhıldan lı navçeki fıreh belav bû û jı bo herdu aliyan ji (Kurd û Tırk) bû sedemê telefatê. İro ji tê zanin, ku hê ji pıraniya gel dı derheqa vê bûyerê da xwediyê agahdariyên xelet û qels ın. Hetta hınek der-dorên ku xwe ronakbir û pêşverû dıhesıbandın, carna bı tesira şopa sosyal-şoveni û bı qesdį, carna ji jı nezaniya xwe jı çarçeva fermi (resmi) dernedıketın, lı hember vi serhıldana mezın fıkreki kevneşopi û rızi dıdomandın.

Lı ali dın çawa dı derheqa serhıldanên Kurd da têri xwe çavkaniyên nıvisandi tunene, her wısa dı derheqa serhıldana Dersimê da ji tune. Jı xeyni pırtûkên Baytar Nûri, yên ku heta iro hatıne weşandın "Dı Tarixa Kurdıstan da Dersim" û "Biranina Mın", dı derheqa vê babetê da bermayiyên ku agahdariyên fıreh û têri xwe bıde hema bêje tune. Lê çı heye yên ku dıxwazın dı derheqa vê serhıldanê da agahdari bıstinın jı aliki va xwedi şans ın. Zemanê ku bı ser vê serhıldanê ra derbas bûye tenê 50 sal e. Bı hezaran kesên ku wan rojan ditıne û jiyane hê ji dı nav me da hene. Bê şık van şahıdên wan rojan, jı bo derxıstın û eşkerekırına rastiyan çavkaniyên heri baş û xurt ın.

## SEDEMÊN PEYDABÛNA SERHILDANA DERSIMÊ YÊN SEREKE

Sedemên ku gelê Dersim berbı serhıldanê tam da, jı sedemên peydabûna serhıldanên kurd yên dın cûdatır nine. Eger mırov bı awaki gıştî bıbêje, ev, siyaseta kedxwari û zulmê ya ku jı ali burjûvaziya kolonyalist va dıhate ajotın bû.

Dıvê mırov vê tıştê ji eşkere bıke ku, nakokiya navbera Dersim û hukumetên nawendi (merkezi) bı dema Komarê (cumhûriyet) ra sinorkıri nine. Ev navçeya Kurdıstanê hê jı destpêkê va bı dewleta Osmani ra ketıbû zıddivê. Mırov dıkare bêje ku Xanedaniya Osmaniyan dı tarixa xwe ya 600 sali da, dı tu demeki da bı Dersimê ra pêwendiyeke baş danani. Gelê Dersim tucar baweriya xwe bı padişahên Osmani-



*Heyeta eşiretên Dersimê, ku dı sala 1926'an da, lı ser daweta M. Kemal çûne Enqerê.*

yan neani, xwe nêzi qebûlkırına otorita wan nekır. Wali û wezifedarên Osmaniyan tenê dı formalitê da lı Dersimê mabûn. Jı ber vê yekê padişahên "Rom" jı bo fetıhkırına Dersimê gelek caran êriş kırın, gundan dane ber agır, mal û mılkê gel talan kırın. Lê Dersim teslim nebû, lı hember hemû zordariyan berxwedanên mêrxasi nişan da û dı dawiyê da hemû êrişên dıjmın tım û tım hate pûçkırın. Eger bı vi hawê lê bête mêzekırın xırabûna Dewleta Osmani û avakırına Komarê yan ji dı şûna Stenbolê da qebûlkırına serbajariya Enqerê jı bo Dersimê qet ne gıring bû. Jıxwe jı ali zordesti û zulmê va Komara Tırkiyê jı Osmaniyan gelek zêdetır gav avêtın. Jı ber vê yekê dı roja iroyin da ji fıkra ku car bı car tê iddiakırın; "Elewiyan lı kêleka hukmê Komarê ci gırt", jı ali kurdên Dersimê va rastiyê nade xuyakırın. Bê şık, mırov nıkare bêje ku êlankırına laiqiyê û propagandeya rejima Kemalist jı bıni va tesir çê ne kır Lê lı aliyê pıraniya qelkê pê hayedar bû ku Mıstefa Kemal siyaseteke durrû û bêbext dajot. Baweriya Kurdan bı siyaseta M. Kemal nedıhat.

Disa bêbawerbûna Dersimê lı hember hukmê Kemalist ji, rasti dema pıştı êlankırına Komarê nayê. M.Kemal, hê dı destpêka bıhêzkırına şerê rızgariya netewi da vê pırsgırêkê lı hember xwe dit. Dı wan rojan da, qısmek jı Dersimiyan dıjmınatiya rêvebırên Tırk dıkırın û bı her awayi bêbawerbûna xwe dıdomandın, qısmek dın ji, -ku vana hejmarek kêm bûn- zıddê vê ditınê dıparastın. Lı gor wan (hejmara kêm) tu sebebek tune bû ku hukumetên Tırk jı mafên gelê Kurd ra rûmetê nişan nedın, jı xeyni wi qeweta wan ji nedıgıhişt viya. Dı rojên teng da jı Tırkan ra alikari pêwist bû. Fıkrên Diyap Axa, Meço Axa û Hesen Xeyri, ku wek mebûs bangkıriyê Enqerê bûn, dı vê hındavê da bû.

Dema ku van munaqeşeyan domdıkır dı sala 1920'i da gelê Kurd, lı Koçgiri seri hılda. Hêla serhıldanê, ci û warên ku qısmek jê cinarê Dersimê bûn. Disa dı eyni demi da, jı ber bangkırına kesên ku lı jor navên wan derbas bû û wek mebûs wê bıçûna Enqerê, eşirên Dersimê lı Hozatê cıviyan û jı hukumeta Enqerê gelek daxwaziyan kırın. Hukumet vê rewşê jı bo xwe baş nedi, bı armanca nermkırına holê heyeta "niyeta baş!" şande Dersimê. Lê ev ji pere nekır û dı dawiyê da tıştek neket dest. Eşirên Dersimê beri heyetê dan û ev têlgıraf şandın Enqerê:

"Lı gor Peymana Sevrê dıvê lı bajarên Diyarbekır, Elaziz, Wan û Bedlisê Kurdıstanek serbıxwe peyda bıbe; binaenaleyh dıvê ev bête sazkırın; nexwe em beyan dıkın ku emê bı zora silah mecbûrê stendına vê mafê bıbın." (25 Teşrini Sani 1336, imze: Pêşevanên Eşirên Dersim yên Xerbi.)

Lê çı heye ku bêyi çarelêkırına pırsgırêka Kurdıstan "şerê rızgariyê" kuta bû, peymana



SEYİD RIZA

Lozanê hate imzekırın. Peymana Lozanê, mafên ku bı peymana Sevrê jı gelê Kurd ra hatıbû garantikırın ji, jı holê rakır. Serda ji, bı hezaran kilometır dûri welatê me kolonyalistên Tırk û dewletên emperyalist lı hev cıviyan, bêyi irada gelê me ev neqıl dı şûna duduwan da welatê me kırın çar parçe.

Hema pışti imzekırına peymanê hukumeta Enqerê dıranên xwe yên bı xwin bı awaki eşkere nişan da. Hukumeta kolonyalist, tucar nedıfıkıri ku mafên netewi û demoqrati ya gelê Kurd nasbıke. Zıddê wi, ew dest avêt teroreke nediti lı hember gelê me.

Pışti bınketına tevgera berxwedana netewi ya Şêx Seid (1925) zordesti û teror zêdetır bû. Qırkırın, darvekırın û nefi dan dû hev. Terora kolonyalist tenê jı bo beşdarên serhıldanê nin bû, bı gışti hemû gel û yên ku berê pıştgıriya dewletê ji kırıbûn dıda ber xwe. Nişangeh welatparêziya Kurd bû.

Hemû van tıştan şıkên Dersimê, bêbawerbûna bı rejimê xurttır kır û rasti ji ev bû. Tevi vê rewşê hukumeta Enqerê lı hember Dersimê jı bo êrişeke eskeri şert û zurûfan dı ci da nedıdit. Hetta, çıqas jı dest dıhat jı bo nermkırına dıjayetiyê dıcedandın Bı pevgırêdana parçeyek jı vê armancê jı serokeşirên Dersimê heyetek hatıbû çêkırın û dı sala 1926'an da ev heyet daweti Enqerê bû, bı rêvebırên dewletê, ku İsmet İnonu ji dı nav wan da bû, hevditın pêk hatıbûn.

Hukumeta Tırk dı eslê xwe da siyaseta xasûki ya rûvi dımeşand. Daxwaziyên bıngehin ,yen ku jı Dersimiyan dıhat, bı ser guhê xwe ra davêt, wana dıewıqand, Jı ber vê yekê ji, carna pêwendiyên navbera hukumet û Dersimê berbı başiyê dıçû, carna ji dıket nakokiyê û dıgıhişt nuqta qetandınê.

Kolonyalistan dı wê demê da lı Dersimê propagandeya inkarkırına Kurdan nedıkırın. Dı şûnda viya da mesela Elewitiyê dıxıstın pêş. Lı her ali propagandevek mezın dıhate kırın, ku M. Kemal bıxwe "elewi" ye û ew "jı bo yekitiya elewiyên dınê" dıcadine, sedemê şerê ku lı hember padişahê Osmani kır ji, ev bû.

Ev propagandeya hukumetê her çıqas jı xwe ra hınek aligır çê dıkır ji, lê disa ji nıkarıbû tesirek mezın peyda ke. Wek ku berê ji hat gotın, siyaseteke durû dıhate ajotın ku ev siyaseta durû Diyap Axa û Hesen Xeyriyê ku pıştgıriya hukumeta M.Kemal kırıbûn ji, jı kuştınê xılas nekır û van bûyerên han sedemên sereke yên siyaseta durû bûn. Hetta dı nav Dersimiyan da baweriyeki wısa heye, ku Diyap Axa -M.Kemal jêra dıgo bavo- bı destê M.Kemal bıxwe hatiye kuştın.

Hukumeta Tırk, bı qasi ku fersend bıdita eşirên Dersimi bı liztıkan tenê bı serê xwe dıhişt û "islah" dıkır. Dı sala 1937'an da jı bo pıştgıriya gısmek eşiran cedandın destpêkırına hınek tevgerên eskeri lı hember eşira Qozû (Koçan) parçeyek jı vê siyasetê bû, ku eşira Qozû jı berê va daxwaziya mafên netewi dıkır û dev jı van daxwaziyên xwe bernedıdan. Lı dorhêla Buhura Eli (Ali Boxazı) bı mehan şer domkır, hêzên dıjmın hınek gund şewıtandın, hejmarek hındık be ji kesên ku jı xelkê hatın gırtın qısmek jı wan hatın kuştın, yên dın ji hatın nefikırın. Dı vê navberê da jı dıjmın ji, hêzeki gıring hate kuştın. Huseynê Kopo û hevalên wi dı şeveki da batalyonek (boluk), ku lı Amûtkayê bı ci bûbûn, jı bıni va hatın kuştın. Dı dawiyê da leşkerê dıjmın dev jı tevgera eskeri berda û paşva vekışiya. Dı salên dû ra hêzên ku gırêdayi ordiya Tırk bûn çend êrişên weki berê cerıbandın. Du caran êriş bırın ser gundên Demenan û Yusufan (lı Rojhılatê Dersimê). Lê van êrişên han ji, wek yên dın tıştek bı dest nexıst.

## BÛYERÊN PIŞTİ DESTPÊKIRINA MUFETİŞİYA GIŞTİ

Hukumeta Tırk,dıjwariya dagırkıri hiştına Kurdıstanê, şıkandına serxwedana gelê Kurd dızanıbû. Jı ber vê yekê ew, siyaseta hember Kurdıstanê tekûz (sistematik) dıkır, dı bın berpırsiyariya organeke pıspor da gıraniya xwe da nawendikırınê û bı vê armancê dı sala 1927'an da dı bın navê "Mufetişiya Gışti organek çêkır. Gerçi lı gor qanûna derketi, van mufetişiyan jı bo hemû Tırkiyê bû lê dı salên pıştre da eşkere bû, ku evya xapandın e, ev organa ku durûvê Walitiya Umûmi yê koloniyê tenê jı bo Kurdıstanê hatıbû sazkırın.

Mufetişiya Umûmi, lı ser Dersimê bı gıringi sekıni. Ev, jı aliki va berhevdanê eşiran, dozên xwinê kış dıkır û bı vi awayi jı xwe ra lı aligıran dıgeriya, lı ali dın ji, riya şiyari û zaninê lı gel dıxıtımand, wana berbı bêhêvibûnê da dehf dıda. Wezifedarên dewletê bı vê armancê pere û pêşkêşkırına hınek imtiyazan ji bı kar dıanin û hemû rêyan dıcenbandın. Dı vê navberê da ev propagande ji car bı car dıhate kırın, ku goya "Dewlet dıxwaze Dersimê şên bıke lê mıxabın hınek kesên niyetxırab nahêlın".

Dema ku rêvebırên hukumeta Enqerê van tıştan dıkırın, Seyid Rıza, Elişêr, Baytar Nûri û qısmek Dersimi ji, jı bo şıkandına propagandeya hukumetê, yekitiya eşiretên Dersimê û xurtkırına wi bê westan dıxebıtin. Seyid Rıza, jı berê va bı niyeta rêvebırên dewleta Tırk zanıbû. Ew, tucar bı soz û bextên kolonyalistan nexapiyabû, baweriya xwe bı wan neanibû, tım û tım bı şık lı hukumeta Tırk nıhêrtıbû. Dı cıvineki da tê gotın, ku "hukumeta Tırk ditına xwe guhartiye û lı hember Dersimê siyasetek dostani dajo", lı hember vê gotınê bersiva Seyid Rıza ya bı nav û deng weha ye: "Qıjık nabe bulbul".

Lê çı heye ku çerxa zeman dıgel kolonyalistan xebıti. Tevi ewqas cehd û xebatê ji, dı navbera eşirên Dersimê da yekiti pêk nedıhat. Gerçi gava mırov serokeşiran û pêşevanên dın yek bı yek bıgıre dest, ew xwedi hısên welatperweri bûn lê riya rızgariyê baş nasnedıkırın û dı têgıhiştına siyaseta hukumeta Tırk da qels dıman. Daw û dozên xwinê, dıjmınatiya eşirên hember, gef û gurên heysıtendınê û menfaetên rojane wek gurê ku jı hewa bı mıj û dûman hezdıke, fersendên nediti dıkır destê hukumeta Tırk. Dewleta kolonyalist lı aliki jı hundır va lı parçekırına Dersimê dıxebıti lı ali dın ji lı Dersimê û dorhêla wi zor dıda avakırına qışle û rêyan, xurtkırına tevgera eskeri.

Dı sala 1934'an da qanûna 2510'an hate derxıstın. Dewlet bı vê qanûnê, jı bo nefikırına gelê Kurd berbı Rojava (Tırkiye), êlankırına navçeyên qedexe yan ji lı mıntıqeyên valakıri bıcikırına nufûsa Tırk dıcadand û bı vi awayi xwe bı qanûn dımıxamt. Disa bı vê qanûnê riya, ku kurdan derxın dervayi sinorê Tırkiyê, vedıbû. Lı gor qanûna nıjadperest ya 2510'i kurdên ku jı Kurdıstanê bıhatana nefikırın û berbı Rojava bıhatana şandın, lı wan deran bı komiti nedıhatın bıcikırın, dı nav nufûsa Tırkan da bıhatana belavkırın. Bı viya armanca jıbirkırına zımanê kurdi û helandına Kurdan dıhate ajotın.

Dı sala 1935'an da rêvebırên Tırk gavek dın ji avêtın û bı destê eşira Kırgan kurê Seyid Rıza - Bra İbrahim dane kuştın. Bra İbrahim mêrxasek hêja bû û lı ser navê Seyid Rıza dı nav eşirên Dersimê da jı bo yekitiya wan dıxebıti. Ev mêrxasê hêja, lı gundê Sinê (Kırgan) jı ali xwediyê mala ku mêvanê wan bû hate kuştın. Seyid Rıza bı vê bûyerê gelek kesıri, pıştî demeke kurt gundên Kırgan kıre hesarê, hınek xaniyan şewıtand. Bı vi awayi bı prowaqasyona hukumeta Tırk, dı navbera eşirên Dersimê da cepheyek dın ji vebû, rewşa holê zêdetır sext bû. Lı gor qınyata me dıgel van tıştan ji, êrişa ku Seyid Rıza bır ser gundên Kırganê, xelet bû. Tevi ku pê dıhate zanin ku tıliya hukumeta Tırk dı vi işi da heye, rêdayina şerek weha nişaneki xurtbûna bir û baweriyên feodal û eşiri bû.

Bı sala 1936'an ra dewleta Tırk a kolonyalist, êdi gıhiştıbû merheleya êrişkırınê ku bı salan hazıriya wi hatıbû kırın. Dı navçê da İdara Urfi hatıbû êlankırın û bı her awayi General Abdullah Alpdoxan bı rayên Meclisa Mezın ya Millet (BMM) hatıbû qewikırın û kırıbûn fermandar. Dı vê navberê da bı qanûneki (Qanûna Tunceli) navê Dersimê kırın Tûnceli, lı nuqta ku çemên Munzur û Harçik dıgıhiştın hev, Kalan, bı navê xwe yê dın Mameki kırın merkez. Qanûna Tûnceli, rê dıda hemû cûre teroristiyên Dewletê.

Dı eyni demi da, pıraniya eşirên Nazmiye, Pulumur û Mazgirt û qısmek eşirên Ovacıxê guh dan bangên fermandarê İdara Urfi û teslim bûn. Dewlet ji, soz da ku destê xwe nede wan. Bı vi awayi dı pıraniya Dersimê da bayê "aşıtiyê" peyda bû. Lê çı heye eşirên ku silahên xwe teslim dıkırın bı rasti mezelê xwe bı destên xwe vedıdan. Ew çıqas bı dewletê ra xweş derbas bıkın bıla bıkın, çıqas bı dılê xwe silahan teslim dıkın bıla bıkın, rejima kolonyalist kırıbû serê xwe ku wana ji, tevi hemû Dersimiyan ceza bı-

kın. Jıxwe dı sala 1936'an da M.Kemal, dı destpêka vekırına xeberdana xwe yê meclisê da armancên xwe bı awaki eşkere anibû zıman:

"Dı karên me yên daxıli da eger babeteke gıring hebe ew ji mesela Dersimê ye. Ev bırina ku dı daxıli da heye, ev pızrıka tırsehêz, jı holê paqıjkırın û avêtına wi jı çı ra dıbe mal bıla bıbe gere mesele jı kokê bête helkırın û dı vi wari da jı bo stendına bıryarên lez, dıvê selahiyetên tam û fıreh bıkeve destê hukumetê."

Herweha serokê hukım M.Kemal ê ku "jı elewiyên Dersimê pır hezdıkır", "dıxwest Dersimê şên û ava bıke", dı derheqa wê derê da dıtına xwe bı vi awayi diyar dıkır.

Bê şık sedemê ku gelê Kurd lı Dersimê dafi serhıldanê dıkır, ne tenê tewra nıjadperest-şoven bû, ku ev tewr tu rûmet nedıda mafê netewi ya demoqratik û xwe dıspart inkariya gelê kurd. Dewlet, bı pevgırêdana siyaseta kolonyalist gelek zordestiyên dın bı kar dıani ku mırov nıkare bandora wi ya ser bûyeran bıçûk bıbine.

Dewleta Tırk, çerxeke zulm û kedxwariyê bû. Wezifedarên dewletê sıvil yan ji eskeran jı insanan ne dıhesıbandın, tınazê xwe bı adet û toreyên wan dıkırın. Destavêtına jınan, bertil, xerac û wd. jı bo qeymeqamên Tırk, eskerên wi, tehsildar û yên dın kıryarên rojane yên dı rêzê da bûn. Lı cihên, ku dıkarıbûn bıçûna, gundi mecbûr dıman wana bıhewinın û xwedi bıkın. Bacên (vergi) gıran pışta gel xûz dıkır. Hetta jı ber vê yekê ye ku General Alpdoxan dı sala 1936'an da dıçe Nazmiyê û dı axaftına xwe yê bı gıre gırên eşiran da bı qasi ku guman nedıkır, leqayi gıliyan bûbû. Jı serokeşirên Hormekê Bertal Efendi yê Cıvariki bı hostati zulm û tedaya lı ser wan anibû zıman, dûra rakırıbû berxeki û avêtıbû ber general û weha gotıbû: "Herweha hesabê viya jı me pırsdıkın. Em nıkarın jı bınê dayina vê hesabê derên" û bı vi awayi aboriya gel, zordariya ser wan dabû ber çav.

## LI DERSİMÊ XEBATÊN PÊKANİNA YEKİTİYÊ YÊN DAWİ

Bıhêzbûna tevgera eskeri, belavok û daxuyaniyên tehdidkar ya fermandariya İdara Urfi roj bı roj Dersimê dıkır xem û fıkara. Dıgel viya Seyid Rıza ji, jı bo pêkanina yekitiyê carek dın ji cehd kır. Cemşid Axayê serokeşirê eşira Ferhadan û Kangozade Mehemed Eliyê serokeşirê eşira Karabalan dı destpêkê da tevi tevgera Seyid Rıza bûn, lê pışti demeki kurt sozê xwe lı erdê xıstın û silahên xwe teslimi dewletê kırın. Ser vê yekê Seyid Rıza, jı bo ku wan jı vê bıryarê bıde poşmankırın gelek cehd kır lê mıxabın serfıraz nebû. Tıştê xırabtır ji, Rêberê xwarziyê Seyid Rıza pêwendiyê xwe û dewletê dıdomand. Lı Rojavayê Dersimê tenê eşirên Baxtiyar û Koçanan bı Seyid Rıza ra bûn. Eşira Kırgan ji bı gışti lı ali hukumetê bûn.

Dı vê navberê da hınek eşirên Rojhılatê Dersim, bı Seyid Rıza ittifaq çêkırın jı bo ku lı hember êrişek eskeri (ya Dewletê) bı hevra dıberxwedın. Bı vê armancê dı bıhara 1936'an da, Seyid Rıza, cıvinek pêkani, ku dı vê cıvinê da serokeşireki eşira Kurêşan-Eli (Eliyê Gax), jı gıre gırên Demenan û serokeşirê eşira Yusufan-Qemer Axa beşdar bûn. Cıvin lı bınya gundê Halvori, lı cihê ziyareta kêleka Çemê Munzur pêk hatıbû û pışti cıvinê, lı eyni ci kevıı avêtın Gola Xızır û derbarê yekitiyê da sond xwarın. Dema ku eşirên Alan û Areyan (lı Rojhılatê Dersimê) pıştgıriya hukumetê dıkırın, tevi ku eşira Haydaran silahê xwe teslim kırıbû ji alinegıriya xwe dıparast.

## ÊRİŞ DESTPÊ DIKE

Lı hember Dersimê êrişa ewıl dı meha İlonê sala 1936'an da pêk hat. Filoki Qewetên Hewayi ya Tırk jı Elazizê rabû û êrişi qonaxa Seyid Rıza ya nêzi gundê Sinê kır. Dı dema bombebarandınê da qısmek jı qonaxê xesar dit. Wê demê Seyid Rıza ne lı wê derê bû. Lê kurê yê bıçûk Resik Huseyin jı lıngê xwe bırindar bû. Ew sal, jı vê êrişê êrişeke dın çênebû.

Dı sala 1937'an da, bı helandına berfê ra 3 qolordiyên gırêdayi Ordiya Tırk berbı hundırê Dersimê ketın rê. Lı navçeya ku bı taybeti hevrıki lê hebû dı mezınayiya Tumen yan ji Tûgayê da 7 hêz û dı mezınayiya Tabûrê da hınek hêzên serbıxwe hebûn. Jı xeyni vana gelek milisên Dersimi, yên ku bı dıl yên ku bı darê zorê, tevi eskêr bûn. Ev milisên ku mıntıqê baş nasdıkırın, hinbûyiyê şert û zurûfê navçê bûn, jı bo Dersimiyên ku lı hember ordiya Tırk şer dıkırın xeterek mezın bûn. Hêza ku ewıl berbı mıntıqa Hozatê -mıntıqa ku dı destê Seyid Rıza da bûkete êrişê, alaya 52'an ya ku dı bın fermandariya Albay İsmail Heqi Talay ê Mıxi bû. Lê çı heye hêza ku berbı cephê hate şandın tenê bı vê alayê sinorkıri nema, hukumeta Tırk hema wê gavê lı dû vê vê alayê gelek hêzên dın ji şand. Eşira Koçan dı cihê xwe da bêdeng ma, eşira Baxtiyar lı 5 nuqteyên cûda kete şer. Serokeşir Şahan Axa buhura Çiyayê Munzur gırt.

Demek şûnda hate xuyakırın ku bı şerê cepheyi şıkandına hêza xurt, ku aligıri jı fırokan û topan dıstend, ne mumkun e. Ser vê yekê Seyid Rıza bı Elişêr ra lı ser rewşê şêwıri û taktik gugart. Bı taybeti heta zıvıstanê riya wextkesıbinê hılbıjart û berê bıryar hatıbû stendın ku esker xwe negıhine Çemê Munzur, lê nıha bûyina vê tıştê dıhate qebûlkırın. Dı eyni hevditınê da jı bo hısandına êrişê û bıdestxıstına alikariyê ji bıryar hate dayin, ku Elişêr derkeve dervayi welat.

Dı wan çaxan da Elişêr dı şıkefteki quntara Çiyayê Tûjık da dıma (iro gel vê şıkeftê bı navê Şıkefta Elişêr Efendi dınase), pıştî ku jı ba Seyid Rıza fetıli dı ci da dest bı hazıriya çûndınê kır. Dı vê navberê da hukumeta Tırk ji, lez dıkır ku Elişêr jı holê rake. Jı bo viya ji, mırovê ku jı bo vê kıryarê bı kar dıhat Rêber Kop bû. Lê Rêber nıkarıbû bıçûya ba Elişêr. Elişêr, lı aliki dıcadand ku Rêber jı riya xırab vegerine lı ali dın ji baweriya xwe pê nedıani, xwe jê dıparast. Ser vê yekê Rêber, jı bo kıryara kuştına Elişêr bı xwarziyê Seyid Rıza - Zeynel Top ra hevditınê kır. Zeynel, tevi ku ewıl dudıli nişan da ji,paşê vê kıryarê qebûl kır, pênc-şeş kesên çekdar gıhand xwe û çû ba Elişêr. Elişêr go qey Zeynel jı bo stendına cebılxanê hatiye, jı ber vê yekê jı şıkeftê derket ku here pêşiya Zeynel lê hate gullebarankırın û kuştın. Dı eyni wextê da Zerife çawa kuştına mêrê xwe dit, hema wê gavê dest avêt demançê, yeki jı qetılkaran bırindar kır û dı eyni gavê da ew ji hate kuştın. Dûra serê Elişêr û Zerife jêkırın û bırın Hozatê. Hukumeta Tırk, wek İngılız û İspanyolên kolonyalist ku çend sedsal berê adeteki wan ê weha hebû, lı gor gıringiya kesê ku serê wi hatıbû jêkırın perû belavdıkırın.

Qetılkırına yeki mina Elişêr ku jiyana xwe jı bo rızgariya gelê Kurd feda kırıbû, jı ali gel va hatıbû hezkırın, bandoreke moralxırakırınê lı ser gel peyda kır.

Seyid Rıza bı vê bûyerê pır kesıri. Hema wê gavê xeber şand dû Şahan Axa û pêşniyara hevditınê lê kır. Dı eyni wexti da serokeşirê eşira Demenan ji, xeber şand dû Seyid Rıza û got: "Bıla were navça me, lı ser serê me cihê wi heye. Bıla were û bıbe pêşengê me!"

Pır neçû, Şahan Axa hat. Tevi xebera ku eşira Demenan şandıbû, bı Seyid Rıza ra lı ser gelek babetan peyıvin û munaqeşe kırın. Şahan, jı ber hınek karên xwe mecbûr bû ku bızvıre nav eşira xwe. Ser vê yekê bı hêviya ku car dın hevdu bıbinın jı wê derê çû. Dı navberê da 10 roj derbas nebûbû, jı bo hevditına Seyid Rıza zıvıri hat. Lê çı heye ku dı nivê rê da. dı demeki xewê da jı ali kurê bırayê xwe yê mari va hate kuştın û serê wi ji wek yê Elişêr hate jêkırın û lı Hozatê pêşkêşi dıjmın bû.

Seyid Rıza lı beramberi Çiyayê Bavê Tûjık ya Munzur lı benda Şahan bû, lê gava xebera kuştına Şahan gıhiştê, kete tenêmayineki mezın. Xwarziyên wi pêra xayin derketıbûn, heri mırovên ku bı wan bawer bû, Elişêr û Şahan bı xayinti hatıbûn kuştın. Lı ser vê yekê çend kesan jı malbata xwe da ba xwe û tevi komek mırovên xwê yên çekdar berbı Ûzûn Meşe vekışiya. Lê Rêber, dı demek kurt da vi xeberê stend û çawa kete pêşiya leşkerê dıjmın, wan ani dı cihê wan (S.Rıza û hevalên wi) da derxıst. Lê çı heye, leşker lı wê derê Seyid Rıza nedit. Ew, bı bıryareke aqılmendi vekışiyabû ciheki dın ê darıstanê. Lı Ûzûn Mêşeyê kurê Seyid Rıza ê mezın -Şêx Hesen û jın û zarok jı malbatê, bı bombeyên destan jı ali leşkerê dıjmın va hatın kuştın.

Pıştî demek kurt ji, lı ser Pıra Erzincanê Seyid Rıza bıxwe hate gırtın. Jı wê derê bırın Elazizê, dad kırın û tevi koma ku pêra; kurê wi yê bıçûk Resik Huseyin, jı serokeşirên eşera Kurêşan Seid Huseyin, serokê eşira Kalan Eli Axa û Fındıkê kurê Qemer Axayê serokeşirê Yusufan hatın bıdarvekırın; paşê hatın şewıtandın û jı bo ku bê mezel bıminın xweliya laşê wan lı hewa hate reşandın.

Dema ku lı cepha Hozat - Ovacıxê van bûyeran dıbûn, disa bı bıhara 1937'an ra hêzên ordiya dıjmın jı Mazgirtê dıkevın rê û lı hêla Harçik berbı Newala Qûtû dımeşın. Wek berê ji hate gotın, eşirên Alan û Areyan, ku lı wê mıntıqê bûn, karbıdestiya hukumetê dıkırın.

Esker çawa jı Harçikê derbas bû nebû, ewıl êrişi gundên Demenan yên nêzi çem kır, wêran kır û şewıtand. Pıştî vê êrişê, Demenaniyan ku berê pıra darin ya ser çem şewıtandıbûn, bı êrişeke xurt bersiva dıjmın dan û ev hêza han jı hev belav kır. Dı mehên dınê da gelek hêz sewqi gund bûn û şer bê navbır berdewam kır çû. Dema rojên payizê seri da dı cepha Demenan da serfıraziya hêzên eskeri (dıjmın) zêde ninbû, jı xeyni zêdekırına esker lı wi ali çem Xesara wan ji ne bıçûk bû.

Berbı zıvıstanê tıştek nû xuya bû. Pıştî ku lı Elazizê Fındıkê kurê Qemer Axa hate bıdarvekırın, bı hınek tesirên nakokiyên mehelli ji, Qemer bı hukumeta Tırk ra lı hev hat û rê da ku lı

gundê wi Tûlıkê da qereqola eskeri ava bıbe. Jı xeyni viya eşira Yusufan bı comerdi dest bı alikariya hêzên eskeri kır. Her çıqas dı mehên zıvıstanê da bı saya qereqola Tûlıkê hêzên dıjmın lı hember Demenanê çend êriş cerıband ji, serfıraz nebûn. Hêzên Demenaniyan hemû êrişan pûç kır.

Bı bıhara 1938'an ra ordiya Tırk alikariyê jı eşira Yusufan ji stend û ev neqıl derket Çiyayê Sor, ku cihki stratejik û gıring bû, qerergeha tumenê kışand wê derê. Dı eyni tarixan da hêzek dın ji, jı Nazmiyê bı rê ket, jı Çemê Harçik buhuri û jı mıntıqa Heyderan derbas bû hılkışiya Çiyayê Zêl ku ciheki stratejik yê dın bû. Çiyayê Sor, lı rojavayê navça eşira Demenan, Zêl ji lı rojhılatê wi dıma. Bı zeftkırına wan deran ordiya Tırk, Demenaniyan jı sê aliyan dıkır hesarê.

Dı vê navberê da dıvê mırov viya bıde xuyakırın: Gava hêza Nazmiyê hılkışiya Çiyayê Zêl eşira Heyderan hınek dı berxwe da lê serfıraz nebû. Serfıraziya wi ne mumkun bû ji. Lewra eşir dı wê demê da hım jı hev belavbûyi bû û hım ji dı teslimbûna sala 1936'an da pıraniya silahên xwe teslim kırıbûn.

Dı eyni rojan da dı cepha Ovacıxê da hınek bûyerên ku ordiya Tırk guman nedıkırın, bû. Weha ku; pıştî kuştına Elişêr û bıdarvekırına Seyid Rıza ji, hukumeta Tırk baweriya xwe bı Dersimiyên vê hêlê nedıani. Yek jı yên ku bı wan nedıhat bawerkırın ji, xwarziyê Seyid Rıza-Zeynel Top bû. Jı ber vê yekê, lı ser daxwaziya fermandarê tumenê Zeynel,wê zıvıstanê lı Ovacıxê, yani hema bêje dı bın çav da derbaskırıbû.

Gava zıvıstan qediya fermandarê tumenê, wek pêşevanê eşirên dın, jı bo ku êrişek eskeri bıbe ser eşira Kalan jı Zeynel Top alikari xwest. Zeynel viya qebûl nekır.

Dı vê navberê da bı eşkerekırına fıkarên serokeşiran, fermandarê tumenê soz û bext da ku wê lı hember wan qet operasyon çênebe û hetta xeteki ji hat kışandın ku hêzên eskeri jı vê xetê derbas nebe.

Pıştî demek kurt lı hember eşira Kalan êrişek pêk hat. Gundên Kalaniyan bı topan hate şewıtandın û kambaxkırın, yên ku mırın çûn, yên mayin ji reviyan çiya û darıstanan. Rojek serê sıbê Zeynel rabû û dit ku fermandarê tumenê lı ser sozê xwe nesekıniye û esker jı xeta xêzkıri berbı rojhılat derbas bûye. Û jı wê gavê pêva Zeynel têgıhiştıbû ku eger işê eşira Kalan bête qedandın wê ica berê xwe bıdın wan. Zeynel vê rewşê famkır lê wek ku wi bıxwe gotıbû, "dereng mabû!" Dı vê navberê da dı nava gel da panik destpêkırıbû. Hê qetliameke gıştî çê nebûbû lê kuştına gelek mırovên gırti, topbarandına ser gundan insanan dıtırsand, mecbûri terıkandına malên xwe dıkır. Bı vi awayi bı hezaran insan xwe lı dehl û newal, darıstanên dora Çiyayê Tûjık gırtıbû.

Ser vê yekê Zeynel, bı eşira Kalan ra qewl dani û kete şer, ku ev eşir hê ji dı bın êrişa dıjmın da bû. Cara ewıl berxwedan lı rojavayê gundê Seyid Rıza -Axdat- lı dorhêla Çiyayê Qendil destpêkır. Dı vê navberê da tabûrek, ku lı qerexê Çemê Munzur dıma, berbı Axdatê kete rê û xwestın ku Zeynel û hevalên wi bıkın hesarê. Zeynel bı viya hısiya, tevi şervanên ba xwe berbı quntara Tûjık Baba (rojhılatê Axdat) kışiyan, şerê xwe lı wır domandın. Armanca wi, pêşibırina bıdestxıstına Çiyayê Tûjık bû û bı vi awayi ji, jı sıvilên ku berbı Demenan dıreviyan ra rê bıhatana vekırın. Pıştî demeki cepha Kalaniyan ya bakûra Tûjık terk lê ket û esker jı ali bakûr ya hılkışiya çiya. Zeynel ev neqıl ji, bı hevalên xwe ra jı Çemê Munzur buhuri û derbasi rexê dın bû, berxwedanê lı wır domand. Niyeta wan, dı fersendeki da jın û zarokan bıbın çiyayên rêzkıri ya Munzurê deynın paşê bızvırın û şerê xwe bıdominın. Mıxabın dı şereki da bı gullên makineliyê bırindar bû û mır. Pıştî mırına wi şer û berxwedan bı pırani kerr bû. Hêzên Dersimi ku bê serok man zêde hebûnek nişan nedan.

Jı eşirên ku dı sala 1937'an da bêdeng mabûn lê bûyerên 1938'an yên gıring bı çavên xwe ditıbûn û dûra dest avêtıbûn çek, yek jê ji eşira Koçan bû. Huseyin Axa û Kopo Huseynê ku dı berxedana êrişa Tırk ya 1937'an da nav û deng dabû, ewıl lı gundê eşirê ya nawendi lı Amûtkayê qereqolê kırın hesarê û eskeran dil gırtın û berê wan dan Hozatê. Ser vê yekê alayek esker êrişi navça Koçan kırın. Dı navbera esker û hêzên Dersimi da şerên dıjwar destpêkırın. Pıştî demeki êriş hate sekınandın û esker paşva vekışiya. Lê pır neçû êrişeke duduwa destpêkır. Dı vi şerê duduwan da Yusuf Axa, lı gaza Somoji hate kuştın. Mırına wi lı ser morala hêzên Koçaniyan bandoreke nebaş peyda kır. Her çıqas Kopo Huseyın, jı bo cıvandın û bıhêzkırına wan cehd kır ji, serfıraz nebû û esker kete Amûtkayê. Amûtka û çend gundên dın hatın şewıtandın. Gundiyên ku lı Amûtkayê ketın dest, çı jın çı ji zarok hemû hatın gullebarankırın û kuştın.

*(Wê dombıke)*

# çend çarin

BARAN

Rojeki hevalan jı Sokrat pırsin:
Tu jı nezanan dıtırsi, yan jı merıvên din?
Got, din xêra xudê ne, bes pêşkari mebe
Lê nezan welle merıva dıkın din

* * *

Şevger e, lê xwe wek tevger nişan dıde
Bı xetên xelkê xwe hozan nişan dıde
Ku pûk û baran dı ser keriyê da gırt
Seyê zexel ji xwe şıvan nişan dıde

* * *

Nızam lı vê dınê dûpışk û şemar bı çıra dıbın?
Sıncê kûtiyan? Ne bihn dıde, ne tê xwarın
Xem neke bo mırınê, ciyê te ji wala namine
Lı vê dınê bêbext kêm nabın û bêşeref pır ın

* * *

Xwe geh lı rastê, geh lı çepê xıst
Tucar jı xwe ra ne gırt rêçeke dırıst
Rızqê mêşa kerê dı bın dûvê kerê da
Te rızqê xwe lı dû şêx û axan derxıst

* * *

Tu ne paşverû, ne pêşverû yi
Ne çep ne rast i, tenê durû yi
Rêvingi wa çûn gıhan menzilê
Tım muxurbe yi, ne şev ne roni

* * *

Xwe bı moriyên erzan mexapin, lı mırcanên veşarti bıgere
Dırêj bıfıkır û kurt bêje, gotına xwe pûl neke
Ka te ewqas da û stend, lo çerçi!
Jı duh tıştek ne maye lı raxısteka te

# BIRYARÊN PARLAMENTOYA EWRÛPAYÊ

Dı 18'ê Heziranê da Lıjna Gıştî ya Parlamentoya Ewrûpayê lı Strasbûrgê cıvinek pêkani û dı vê cıvinê da dı herheqa Qırkırına Ermeniyan da bıryarek gırt. Lı gor vê bıryarê, dı sala 1915 - 1917'an da êrişên ku jı ali dewleta Osmani va hatıbû ser Ermeniyan wek Qırkırın hate qebûlkırın. Dı sala 1948'an da Koma Mılletan ji, ev bıryar stendıbû.

Parlamentoya Ewrûpayê bı vê bıryarê hukumeta Tırk ya nıha wek berpırsiyar nabine, lê jı ber ku hukumeta Tırkiyê vê qırkırınê qebûl nake, ew ji tê sûcdarkırın û wek berpırsiyar tê ditın. Bıryar, tenê lı ser Qırkırına Ermeniyan ne hatiye çarçevekırın.

Wek tê zanin jı berê va hukumetên Komara Tırkiyê, xwe nêzi qebûlkırına qırkırına Ermeniyan nakın. Jı ber vê yekê Parlamentoya Ewrûpayê, Komara Tırkiyê û hukumeta nıha ji şırikê vê sûcê dıbine û wi mehkûm dıke.

Tırkiye jı berê va dı pırsgırêka navbera xwe û Yewnanistanê da qaidên navnetewi dıxe bın lıngan û tewreki êrişkar û dıjmınati nişan dıde. Dı bıryara Parlamentoya Ewrûpayê da, ev tewrê hanê ji tê rûreşkırın.

Jı 1974'an vırda, Tırkiye, hema bêje nivê Qıbrısê bı darê zorê zeftkıriye û leşkerên dagırker hê ji dı wır da ne. Tevi bıryara Koma Mılletan ji, niyeta wi tune jı wır vekışe. Hetta niyeta wi ew e ku Qıbrısê deman bıke. Her wısa dı naveroka bıryara Parlamentoya Ewrûpayê da ev dagırkeri ji tê protestokırın û jı Qıbrısê vekışandın tê xwestın.

Parlamentoya Ewrûpayê lı dıji zordestiya ser gelê Kurd ji radıweste û jı bo nasandına hebûna gelê Kurd û mafên wi yên demoqratik ji bıryar dıgre.

Jı ber ku cunta faşi heq û azadiyan jı gel ra qedexe dıke û tu rûmet nade wan, Parlamentoya Ewrûpayê, Tırkiyê mehkûm dıke û jı ber van rûreşiyên wi, daxwaza endametiya Cıvata Abori ya Ewrûpayê nayê qebûlkırın û daxwazên bıryarê, dıbın asteng lı pêşiya endametiyê.

Herweha Tırkiye jı gelek aliyan va tê sosretkırın û gelek planên wi dı qırıkê da dımine. Gava mırov şoveni û barbariya rejima faşist bıde ber çav, bı rasti van bıryarên hanê qels ji dımının.

## LI SER KURDAN

# CIVİNA AKADEMİYA PROTESTAN

Lı Elmanya Federal, dı nav komên biyani da, Kurd bı pırbûna xwe, dı seri da, ciyê 4'an dıgırın. Bıyaniyên ku lı Elmanyayê dıjin, hındık be ji xwediyê hın mafan ın. Lê herçend kurd komeke mezın ın ji, disa yên ku jı mafên heyi bêpar ın, kurd ın. Hukumeta Elmanya Federal, van mafan nade kurdan, hin serda ji siyaseta şoveni û nıjadi ya dewleta kolonyalist a tırk lı hember gelê kurd tesdiq dıke; vê siyasetê bın kırasên cur be cur da, lı vır dajo.

Jı roja sazbûna xwe heta iro KOMKAR lı dıji vê neheqiyê bı rık xebıti; çû ser vê neheqiyê, daxwaza gelê me, lı vır, jı hêzên humanist û demokratik ra pêşanda. Wek: "jı bo zarokên kurd xwendına bı zımanê dê", "Weşana radyo û TV'ê bı zamanê kurdi", "Şewırgeyên cıvaki jı bo kurdan". Gelek rêxıstınên demokratik û humanist: Sendika, dêr, insiyatif û kesan jı xebata KOMKAR'ê ra pıştgıriya xwe nişan dan. Yek jı van ji AKADEMİYA PROTESTAN e.

Roja 24'ê Heziranê, Akademiya Protestan derbari mafên kurdan da lı Frankfurtê cıvinek çêkır. Pıştı cıvinê, lı ser vê babetê dazanek jı bo rojname û ajansan hat belavkırın. Dı vê dazanê da weha tê gotın:

"Lı Elmanya Federal, Komita Xebatê ya Akademiya Protestan ku jı bo pırsgırêkên bıyaniyan dıxebıte, lı ser rewşa 300 hezar kurdên ku lı Elmanya dıjin, cıvinek çêkır û ev babet hat munaqaşekırın.

"Kurdên ku lı Tırkiyê, zıman û çanda wan dı bın zordestiyê da tê gırtın, lı elmanya Federal dıkarın xwe bıdın naskırın. Gelek komeleyên wan hene û ew bı riya van komelan, bona bêşvebırına çanda xwe ya kevneşopi (traditionel) xebatê dıkın. Jı bo xebatên çandi yên wedeki dırêj û efektiv, wek hemû bıyaniyên dın kurd ji hewceyi desteg û teşfiqa dewletê nın.

"Roja 9'ê İlonê 1985'an, lı ser pırs-daxwaza (motion) SDP'ê 'Lı Tırkiyê mafên insani' hukumetê eşkere kırıbû ku, ewê dı tanga federali da, pıştgıriyê nedın xebatên kurdan û ermeniyan. Em wek Koma Xebatê ya Akademiya Protestan, vê muamela lı dıji kurdan û ermeniyan, lı dıji pransibên wekheviyê dıbinın. Em jı hukumeta federal daxwaz dıkın ku vê bıryarê rake. Ne tenê em, çend Akademiyên Protestan yên dın ji, emê bı hevra, dı rojên pêş da ji, jı bo bıdestxıstına alikariya wan, (kurdan û ermeniyan) eleqekeyeke taybeti (xusûsi) nişandın. Herweha em derbari mafên kurdan û ermeniyan da, pıştgıriyê dıdıne teşebûsên Parlamentoya Ewrûpayê. □

## KOMELA KURD A DEMOKRATİK LI AWUSTRALYA HATE DAMEZRANDIN

Serê Gulanê (1987) jı welatê me bı hezaran kilometır dûr, lı parzemineki (qıta) dın, komeleke kurdan bı navê Komela Kurd a Demoqratik-lı Avustralya hate damezrandın.

Komel, dı belavoka xwe yê damezrandınê da dıde xuyakırın, ku wê tekoşina rızgariya netewi ya gelê kurd bı awaki heri baş bıdın naskırın, wê jı bo xurtkırına alikariyê cehd bıkın. Û dı belavoka xwe da weha dıbêjın:

"Wextê xurtkırın û pıştgıriya Komela Kurd a Demoqratik-lı Avustralya hatiye. Komela me, bê şert û şırût lı hember kevneperestiya dınê parêzkarê şerê rızgariya insaniyetê ye. Komela me, bı hemû saziyên pêşverû, demoqrat ra jı hevkari û dan û stendınek wekhevi ra dılsoziya xwe dıde xuyakırın."


F. BARAN



## JI NAV EDEBİYATA KURDİ YA KLASİKİ

# NALİ

**(1798 - 1855)**




Çawa tê zanin helbesta kurdi ya klasiki dı sedsalên XIV û XV'an da gulvedaye. Dı van sedsalên navin da lı Kurdıstanê gelek mirti hebûn. Wek: Botan, Bahdinan, Erdelan, Baban, Şarezûr û yd... Ev mirtiyên kurdi jı gelek aliyan va serbıxwe û nivserbıxwe bûn Çawa dı warê eskeri û siyasi da wısa ji dı warê xwendın. ılm û hunerê da ji lecek (reqabet) hebû dı navbera wan da.

Xurtbûn û pêşketına zıman û edebiyata kurdi, herdem bı rewşa siyasi va gırêdayi maye. Kengê pıçek azadi û serbesti peyda bûye, hıngê zıman û edebiyata kurdi geş bûye, pêşda çûye. İro ji wısan e.

Dı sedsala XV'an da, ku hıngê lı Kurdıstanê mirtiya BOTAN xurt bû, lı paytextê mirê Botan, lı Cızirê medrese û mızgeftên bı nav û deng hebûn. Jı çaraliyên Kurdıstanê feqeh û xwendekar dıhatıne wır. Pıraniya şa'ırên edebiyata kurdi ya nıvisandi, lı wır xwendına dini û ilmi gırtıne. Hozanên wek Melayê Cıziri (1570 - 1640) û Ehmedê Xani (1651 - 1707) ji lı Cızirê xwendıne. Van kesan bı eserên xwe yên edebi, rûmeta çand û zımanê kurdi bılındkırıne ku iro ji ew serbılındaya me ne.

Bı jarbûna mirtiya Botan ra, edebiyata nıviski bı kurmanciya jorê kêm bû.

Paşê em dıbinın ku, wexta lı rojhılat û başûrê Kurdıstanê (iro Kurdıstana İranê û Kurdıstana Iraqê), mirtiyên kurdi xurt dıbın, edebiyata kurdi bı zarê kurmanciya jêrê pêşda dıçe. Dema mirtiya Erdelan (paytextê wê Sınê) û mirtiya Baban (Suleymaniye) da 'ılm û huner pêşda dıçe. Şaırên bı nav û deng dıgijın. Keça bırayê mirê Erdelanê Max Şeref Xanım Kurdıstani, ku navê wê yê nıviskariyê Mestûre ye, nımûneyeke berbıçav e. Mestûre (1805 - 1847) bı kurdi helbest nıvisine û bı farısi "Diroka Erdelanê" nıvisiye, ku wê çaxê lı temamiya Rojhılatê, ronakbirên jın wek wê pır kêm, yan ji qet tune bûn.

Dı sedsala XIX û XX'an da lı başûrê Kurdıstanê gelek şa'ır derketıne. Dı nava wan da, Nali cihê pêşin dıgre. Dı vê benda jêrê da emê bı kurti behsa jiyana Nali û berhemên wi bıkın. □



Navê Nali yê rasti Xıdır e. Lawê Ahmed Şaweys, jı eşira Mıkayilan e. Nali navê wi yê nıviskariyê ye. Ew lı gundê Xal û Xol hatiye dınyayê.

Nali jı ber xwendına xwe ya medresê lı gelek bajarên Kurdıstanê maye. Wek: Sınê (Senendaj), Sabılax, Helebce û Suleymaniye.

Dı sala 1830 da çû hec û jı wır vegeriya Şamê û lı wır ma. Pışti çend salan jı wır çû İstenbolê. Lı İstenbolê bı gelek zana û ronakbirên kurd ra bûye nas. Dı dewrana Nali da, lı başûrê Kurdıstanê mirtiya Baban hukum dıkır. Jı hın helbestên wi wısan diyar e ku pêwendiyên Nali dıgel mirên Baban: Sulêman Paşa (1838 yan ji 1839 mıriye) û kurê wi Ahmed Paşa (mirê Baban yê heri paşin e, dı sala 1845 yan ji 1846'an da mıriye) hebûye.

Dema ew lı Şamê bû, mirtiya Baban dı sala 1847'an da jı aliyê dewleta Osmani va hat belavkırın. Lı ser vê yekê Nali geleki dılsoti û xemgin dıbe. Wi hezkırın û hesreta xwe jı bo welat, dı helbestên xwe da aniya zıman. Şı'reke wi ya geleki bı nav û deng heye, ku wi jı Şamê bo şaireki kurdi yê wê demê Salım şandiye. Dınıvise:

*" Qurbani tûzi rêgetım ey badi xoş murûr*
*Ey peyki şareza bı hemû şari Şarezûr "*

Salım ji bı helbesteki bersiva wi dıde. Ew rewşa wê demê: çawan tırk ketıne Kurdıstanê(dorhêla Suleymaniyê) û zulmê dıkın dınıvise. Lı ciyeki dıbêje:

*"Lew sayewe ke hakımi Baban be der kıran*
*Ney diwa kes le çihrey kes cewheri huner"*

Bı zımanê kurdi helbest nıvisandın jı bo Nali serbılındi ye, ew bı vê yekê iftixar dıke (Bıli kurdi, wi zımanê erebi, tırki û farısi ji baş dızanıbû.).

Dı helbestên Nali da herweha evin û tebi'et ji du temayên xurt ın. Ew dı xortaniya xwe da jı keçekê hez dıke bı navê Hebibe.Wi gelek helbestên eviniyê lı ser wê nıvisine.

Nali helbestên xwe bı weznê arûz nıvisine. Wi hemû şêweyên helbesta Rojhılatê (Qeside,Xezal,Rubai û yd.) bı kar aniye.

Diwaneke Nali heye ku heta nıha gelek caran hatiye çapkırın.

Hebibe

1- Cenani wek cinan kırdım be mawa
(Hebibe) i (malyawa), mali awa

2- Xendew demi (mehbûb)e ke wa zor nımekinım
Bes xûşe eger xo nımeki zexm û bırının

3- Pêm delên (mehbûbe) xêl û qiçe, meyli şer deke
Xêl û qiçe, ya tırazûyi nazi nextê ser deke?!

4- Mujgani siyeh meste wekû çawi (hebibe)
Xaret ke bıken dên û deçın rûh berfênın

5- Le dunya cenneti baqi telari şahiye saqi!
(Hebibe) turreyi tewqi mıli şirin û 'ezraye

6- Ax... lı gel ê me (hebibe) seri peywendi niye
Neyşeker qedde, bela bendi heye, qendi niye

7- (Nali) lebi (hebibe) hem teyıbe, hem tebibe
Xulaseyi lebibe, fermanberi lebi be

8- Destım lı gerdeni xot helmeqre ey (hebibe)!
Webzane xuyni xuman, ya mınneti reqibe.

*

Saqi! were, meyxaney dıl kon e rehiqi
Ger mayili tewfi herem û beyti 'etiqi

Yek rengim û bê rengim û rengin be hemû reng
Bem renge debê reng rıji 'ışqi heqiqi

Mırwari ekkem weku yaqûti, rewane
Saqi! bıde lew le'le şerabêki 'eqiqi..

Daim le hezer da seferi be.. le weten da
Xurbet geş û acız be, eger ehlê teriqi

Xelqê ke hemû kû deken û beste zubanın,
Ba bên û le "Nali" bıbyen şı'ri seliqi

*ÇAVKANİYÊN NIVÎSÊ:*


1) *Ferhad Shakely, Svensk-Kurdisk Journal 3, 1985 Stockholm.*
2) *Prof.Qanatê Kurdo, Tarixa Ed. Kurdi-2 rûp.5, Stockholm 1985.*
3) *Tosınê Reşit, "Mestûre", Roja Nû 5,1984.*
4) *Nali, "Diwani Nali" 1976 Bexda.*


# gotinên pêşiyan

Berevkar : **SALIH**

1 Mêrê tırsonek singa gewr nabine.
2 Xwediyê sebrê, dıbe mulûkê Mısrê.
3 Hespê çê êmê xwê zêde dıke.
4 Şûna wan kund dıxwune.
5 Mar jı pûngê dıqehıre, dı devê qula wi da şin dıbe.
6 Xweli lı wi seri ku sed seri jê neqehıri.
7 Teyrê teyr warê bavê xwe û bapirê xwe zane.
8 Mırov lı gor lıhêfa xwe lıngê xwe dırêj dıke.
9 Kûçık goştê kûçıka naxwe.
10 Ga dımre çerm dımine, mêr dımre nav dımine.
11 Giha dı bın kevıra da namine.
12 Ciyê ku agır lê tune, dûxan dernayê.
13 Dikê çê dı hêkê da azan dıde.
14 Çêlıkê mar bê jehr nabe.
15 Çiyayên bılınd bê ba nabın.
16 Newalên kûr bê av nabın.
17 Ne jı fesada be, gur û mih wê bı hevdu ra bıçêrın.
18 Bınê tûrıkê mırov bı qul be, mırov têr naxwe.
19 Rasto bı rasti, xwaro şıkesti.
20 Deng jı tasê hat, çı rast çı derew.
21 Kumê Elo lı serê Celo.
22 Şam şekır e, welat jê şêrintır e.
23 Şam dûr e mışar ne dûr e.
24 Golıkê malê jı gayê malê natırse.
25 Zarok fêkiyê mala ne.
26 Bê Xwedê dıbe, bê xwedi nabe.
27 Pışta xwe nede diwarê xerabe.
28 Dınya siya darê ye.
29 Şeva reş jı êvarê da xuyaye.
30 Tajiyê bı zorê bıbi nêçirê, tê çı nêçirê pê bıki.
31 Qadiyê zarokan xwe kuştiye.
32 Kera bı guh neke, kora bı çav neke.
33 Dıjmın bıbe nan neke paxıla xwe.
34 Bı dû tengayiyê fırehi ye.
35 Ê têr hay jı birçi tune ye.
36 Bı pırsê mırov dıçe Xursê.
37 Rojek wê bê gur û mih wê bı hevra bıçêrın.
38 Jı ava ku deng jê tê netırs, jı ava bêdeng bıtırs.
39 Mêrê çê xwediyê gotına xwe ye.
40 Kewê rıbat çavê mêkewa xwe ye.
41 Gihayê hewşê tal e.
42 Diwaro mın jı te ra got, bûkê tu fam bıke.
43 Kero nemre bıhar hat, pirê nemre qivar hat.
44 Lêv jı dıranan ferztır ın.
45 Xwin nabe av.
46 Kurmê darê ne jı darê be, dar kurmi nabe.
47 Kew dıjmınê qewmê xwe ye.
48 Destê bı tenê, bı şêrê Eli be deng jê nayê.
49 Dewsa xencera wında dıbe, dewsa xebera wında nabe.
50 Çıqas bılınd bınêri tê bıkevi.
51 Aqılê sıvık barê gıran.
52 Dı fırehiyê da herkes lawê bavê xwe ye.
53 Ê pivazê nexwe bêhn jê nayê.
54 Ava ser berûyê, zava bı dılê xesûyê.
55 Mırov jı beroşa xwe têr nexwe, jı beroşa xelkê têr naxwe.
56 Mın ev por lı ber dar û deviya sıpi nekıriye.
57 Bayê hınka tê kayê dıdêre, bayê hınka tê şebeşê dıdêre.
58 Xwıra mırov bı destê xelkê naşkê, ille bı destê mırov.
59 Bûka salê delaliya malê.
60 Kerê ker neqeba ku bıkevê, derbek dın tê da nare.
61 Ne nan bıdınê, ne mikuta lêx.
62 Pıraniyê hındıkayi daniye.
63 Tu bı ki ra bıgeri tê bıbi wek wan.
64 Berxê nêr jı bo kêrê.
65 Bûk lı hespê ye, kes nızane nesibê ki ye.
66 Cıvata çûkan lı ser sımbılê garıs e.
67 Kes nabê dewê mın tırş e.
68 Xortê gerıyayi çêtır zane jı kalê zemane.
69 Jı dınyayê bıpırs bı aqlê xwe bıke.
70 Jı Devê mestır Fil heye.

# ŞERVANEKİ BIÇÛK Ê VİETNAMİ

NGUYEN THAN

*Wergerandın jı tırki: DILSOZ*



Ko-Long derketıbû ciki bılınd û rapora karên ku jı heq derketıbû dıda. Yên ku lı pêş wi bûn berpırsiyarê Rêxıstına Rızgariya Vietnamê bûn. Ko-Long jı meydana şer dıhat.

Ew ji, wek hemû mırovên zozanên bılınd yên rojava çavên wi dûrditi, awurên wi gelek tûj bûn. Eniya wi fıreh, lêvên wi pembe û tenık bû. Jı rûyê wi mêrxasi û cerıbandın dıhate xuyakırın.

Ko-Longê me hê gelek cıwan bû. Lı dora 18 sali bû. Lê, hê jı nıha va, navê wi dı stranên gel da cih gırtiye, bûye destan û wek şervaneki mêrxas, payebılınd tê bıbir anin.

Dı gundê Ko-Long da bı navê KOT mırovek hebû. Dı gund da yê heri sere ew bû. Emrê wi jı 80 derbas bûbû, lê pışta wi xûz nebûbû, wek zınareki lı serxwe bû. Ko-Long bavê xwe naskırıbû, piremêrên gund dıgotın, ku bavê Ko-Long ji dı emrê Apê Kot da bûye û ew ji zılameki serxwe ra bûye.

Apê Kot lı oda gund, –ku dı quntara çiya da bû– lı ber tıfıkê rûdınışt û jı zarokan ra behsa çiyan, çeman, darıstanan dıkır. Jı 20 - 30 sali vırda, xortên gund bı şiretên Apê Kot mezın bûbûn. Tıştên ku Apê Kot nızanıbû, tune bû. Wi axaftınên xwe bı helbestan, bı destanan dınexşand û bı sewta xwe ya bılınd stranên gelêri dıxwend. Ew hostayê sıneta axaftınê bû. Ko-Long jı deh saliya xwe vırda, şiretên Apê Kot kırıbû wek guharên guha û tım bıbir dıani. Wek ava kanisar ya seriya gund, şiretên Apê Kot vexwarıbû, wek şirê dayikê bı wan têr bûbû. Dı yanzde saliya xwe da eniya wi fıreh bû. Dı şevên bê xewi da bı guhdarikırına Apê Kot gıhişt û pıjiya. Gava bû 13 sali, ew ji têgıhişt, ku çı bela ser serê wan dıgere. Ax..., gelo lı rûyê dınê, geleki ku bı qasi wan êş û teda ditıbın û jiyabın hebû? Gelo ki bı qasi wan jı destê dıjmın kışandıbû û ki bı qasi wan nızım hatıbû xıstın?

Apê Kot wextê behsa serhıldana PAC-DO dıkır, dengê wi dırıcıfi û weha dıgot: "bı nivro ra jı sıngên sedan kes xwin pıjıqi... Xwina welatiyên me..."

Serhıldana Pac-Do bı xwinê hatıbû temırandın. Bavê Ko-Long dı sefên pêş da şer kırıbûye. Ew gırtıne. Dest û piyên wi bı têlan gırêdane. Leşkereki Diem, ew bavê kal jı porê wi yê sıpi kaş û berekaş kıriye, bıriye qerexê Çemê Piayê.

Çend kesên hov wek heywanên kûvi, hatıne wê derê û destên wan da darên hesmi hebûye. Lı ser van kesan yeki Emrikani hebûye û bı darên hesmi lı pışt û serê kalo xıstıne. Ava Çemê Piayê jı xwina vi kali sor bûye. Serê wi yê sıpi bı ser pêlên avê ketiye û çûye.

Ko-Long, wextê guhdariya vana dıke dıranê xwe dışıdine, wısa dışıdine ku canê wi jı ber dêşe. Dı 13 saliya xwe da hini negırinê dıbe. Hini şıdandına dıranan, guhdarikırın bê hêstırê çavan û hini guhdarikırına bêbextiya dıjmın dıbe.

Apê Kot heta sıbê behskırıbû. Gava zereqa tavê bı ser çiyayê Şû-Pong da tirêjên xwe berdıde, Apê Kot weha qiriyaye; "rakın çekan!" û gotiye, ku iro roja wan û dıjmın e.



Ko-Long rabû, jı oda gund derket. Çû, serekê bergirê (milis) gund dit. Serok, rûnıştıbû û tıfınga xwe paqıj dıkır.

Ko-Long dıbêje:

– Mın ji bıstine cem xwe. Ez ji dıxwazım şer bıkım.

Mêrık wextê lı vi zarokê nıhêrt, roja ku cara yekem çek dabûn destê wi, bıbir ani. Ko-Long nışkava mezın û bı rasti bûbû zılamek. Serok rewşa wi ditıbû, famkırıbû. Lê disa ji hema wê gavê negot "erê".

– Tu dıxwazi bıbi pêşmerge (gerilla)? Jı bo te hê gelek zû ye. Hê telê te bı qasi tıfıngê tune. Diya te pir, bırayê te bıçûk e. Tu dıkari bı kêri kar û xebatên çandi yê gund bêyi. Tu strana xweş dıxwini, baş dıleyizi.

Ko-Long dı berxwe da:

Na. Ez dıxwazım çek lı dest, şer bıkım.

Lê Ko-Long nıkarıbû serok bıxapine.

Ko-Long sêwi bû, bı diya xwe ya pir ra dıjiya. Ew hini bırina navoka xwe bıxwe bûbû, wextê serê wi dıkete tengasiyê bı kesi va ne dınaliya.Wextê ku canê wi dıêşiya dıranê xwe dışıdand, tıştek nedıdıta derva. Wextê bırçi dıma dıçû darıstanê û lı wê derê jı xwe ra hınek tıştên xwarınê dıdit û dızanıbû xwe têrke.

Wê şevê xew neket çavê Ko-Long. Dotıra rojê jı bo bırina şaxên daran rakır qama xwe û tenê bı serê xwe çû darıstanê. Madem wısa bû, ew ji, wê wek zanina xwe şer bıkıra.

Sê roj jı holê wında bû. Roja çaran hat û serokê bergir dit. Destıkeke sıng da ber xwe. Serok lı sıngan nıhêrt. Pênc sıng, her pênc sıng ji, jı xwinê sor bûbûn.

– Te vana kıre kêderê?

– Çavkaniya Çemê Piayê. Jı zû va lı wır çıkandi bûn. Lı ser komandoyan.

– Çend bırindar, çend kuşti?

– Hemû kuşti. Ez lı dû wan çûm. Pênc cendek avêtın erebê.

– Baş e, got serok, hevalên me wê gelek kêfxweş bıbın, jı heft sali heta heftê sali wê şa bıbın. Nıha lı mın guhdarike, bı roj tê weri lı wê derê qefên (dafık) weha hazır bıki, bı şev ji dı xebatên çandi û sınet da beşdar bıbi. Baş e? Heta çend salê dın tê ji tevi tevgera pêşmerge bıbi.

Ko-Long deng nekır. Têgıhiştıbû, ku bıbe peşmergeyek baş, xebatên hêja pêk bine û layıqê navê gelê xwe be.



Çû ser riya, ku hêzên dıjmın pır caran dı wê da derbas dıbın. Wextê jı dûr va lı rê dınıhêrt, gotına Apê Kot "jı singên sedan kes xwin pıjıqi, xwina welatiyên me...", bıbir ani. Serê Ko-Long bı ramaneki ertılibû û xwe bıxwe dıgot: "Ezê vi hesabi jı wan bıkım caw! Ezê hemûya bıkujım, hemûya!"

Lê mıxabın destê wi vala bû. Mırov çawa bıke? Bı bazdanê vegeriya malê, rakır tir û kevanê xwe û zıvıri. Ew ji wek her kesên jı vê mıntıqê, hê jı 10 saliya xwe vırda teyrên lı fırê dıani xwarê. Nişana nobedarê dıjmın gırt. Tıliyên wi bê rıcıf têlê kevanê berda. Tir pekiya. Baş nişan gırtıbû. Xwina sor lı ser rê peşkıli.

Vegeriya gund lê jı serok ra tıştek negot. Ya nobedar ne mırıbe? Sekın çêtır bû. Dotıra rojê bı banga sıbê ra bı rê ket, dı rê da rasti leşkereki Saygoni hat û pêra axıfi,

– Çı bû bı mılê te?

– Yeki Viet Kongi lêxıst. Baş bû, ku tir ne bı jari bû. Nexwe ez mıri bûm.

Ko-Long hema wê gavê vegeriya gund û jı diya xwe pırsi:

– Dayê, dı gund da ki dızane jariya tirê çêke?

Dayik lı kurê xwe nıhêrt. Bı kurê xwe dızanıbû ku ew xwe dıke, zarokek bı rık bû. Tım dıfıkıri, ku ew lı bavê xwe çûye.

– Bavê te dızanıbû jariya "a-kam" çêke. Bı wê jariyê bı sedan pılıng kuştıbû. Lê nıha, wê jariyê tenê Apê Kot dızane.

Û şevek dı oda gund da kalek porsıpi û xortek 14 sali bı ser tıştekî da xwar bûn. Kalo sê tirên bı jari da vi xorti. Van tiran jı dara Bambûyê hatıbûn çêkırın, wek pola û bırıqandi bûn. Tira heri baş jı vi zozanê bılınd, jı darên Bambûyan yên ku dı vi erda sor da şin dıbûn, dıhatın çêkırın. Dı serê tirê da şanek sıpi hebû. Ev şan jariyek, ku bı ava dara a-kam hatıbû ecınandın..

Apê Kot, bı dengê xwe yê gurr, ku dı çilayên asê da vedıgeriya, got:

– Ko-Long, tê heyfa bavê xwe bıstini. Tê heyfa çiyayên Gia-Rai û kaniyên wê bıstini.

Ko-Long xwe berda qerexê riya 14'an. Dı bınê dareki da xwe teland. Bı saetan xwe ne lıbıtand û tenê lı rê mêze kır. Tirê ku berda dıvê ciyê xwe bıdita. Heta nivro, heta ku siya wi dı bın lıngên wi da wında bû, dıranê xwe şıdand, sekıni. Leşkereki Saygoni dıhat. Heta, ku dı navbera wi û leşkerê Saygoni da 8 metro ma, sekıni. Paşê tirê xwe berda. Tir fıriya û çû dı zıkê



leşkerê kırêkıri da çıkıli. Jı devê mêrık xırıniyek kışiya, wek masiyan ku lı şewkê ertıli be, pırpıti. Dûra dıjmın gullebaran kır. Vızina gullan bû, şaxên daran dışkiyan. Ko-Long bêlıv sekıni bû û temaşe dıkır. Mêrık nemırıbû. Bo çı nemırıbû?

Ko-Long bı Apê Kot Şêwıri. Apê Kot keniya:

– Yê ku derba tira a-kam bıxwe şev û rojek dıji, paşê dımre. Lê derba herdu tirên dın dı ci da dıkuje.

Ko-Long, cara sısiya ye, ku disa lı qerexê rê bû. Tira duduwa avêt. Tir dı sıngê nobedar da çıkıli, nobedar qelıbi û heta tirê jı sıngê xwe kışand, hema dı ci da wek komek hesti lı erdê bû terş.

Tira sısiyan ji dı sıngê leşkereki dın da çıkıli û hema dı ci da ket û mır.

Apê Kot, lı dervayi gund çû pêşiya Ko-Long. Ew rakır û bır ba serok, got:

– Bınhêr serok! Ko-Long êdi heqkıriye, ku bıbe pêşmerge. Tıfıngeki bıde wi ji.

Serok tıfınga xwe dayê. Sê gulle ji kır kefa destê wi û got:

– Ko-Longê pêşmerge.., van sê gullê han tê mana sê cendekên dıjmın. Gere yek jê vala neçe, te famkır?

Ko-Long dı şerê xwe yê ewıl da bı tıfıng û sê gulle yên xwe, wezifa xwe bê kêmani bı ciani. Jı serê sıbê heta nivro wek pısikekê lı dû dıjmın geriyabû. Gotına serok jı bira wi dernedıket.Her

gullek cendekeki dıjmın bû, her gulle ku vala bıçûya, dıhat wê manê,, ku gulleyek jı pêşmergan hatiye dızin û ziyan bûye.

Na, gere gulleyên Ko-Long vala neçûya. Tıştek weha bı pêşmergeyeki nedıket. Lê gelo, bı gulleki cendekek ne hındık bû? Gelo nıkarıbû zêtır bıkıra?

Dı navbera Ko-Long û dıjmında sê gav hebû, jı nêz va bı dû wan ketıbû, lı benda fersendeki bû. Ha... nıha ev fersend dı destê wi da bû. Leşkerên dıjmın, jı bo xwarınê lı hev kom bûn û rûnıştın. Ko-Long pala tıfınga xwe da darê, nişan gırt û gulle pekiya. Pênc dıjmın qelıbin erdê.Pêl lı sefên dıjmın ket, lı çep û rastê dest bı revê kırın. Gulla duduwan ji vala neçû. Gulla sısiya veşart. Ewi ev gulle bıbıra pêşkêşi berpırsiyarê serokê karê leşkeri bıkıra.

Jı wê rojê pêda peşmergeyên gund destpê kırıbûn, wek Ko-Long dıjmın gullebaran dıkırın. Jı vi icada nû gelek hezkırıbûn. Ko-Long tucar qayil nedıbû, ku bı gulleyek leşkereki dıjmın bê kuştın. Ew bı sê gullan heft leşkerên dıjmın, yên ku dıxwestın zeviyên çandıniyê bışewıtinın, kuştıbû. Dı şerek xwe yê dın da ji, 19 leşkerên, ku hêzeke kıfşê bûn, bı heft gullan kuşt.

Apê Kot destaneke nû efrandıbû. Dengê wi cıwan û wek kanisarên, ku jı zınaran dıherıki, zelal bûbû.

— Mırovên vê hêlê, guh bıdın dengê mın. Lı quntara vi çiyayê Pong da pêşmergeki nû bejın da. Herkes jê ra dıbê "Bırakê Bıçûk". Ez dıbêm "Xwarzi". Ew lawê welatê me ye. Lawê çiyan, darıstanan û çeman. Rojek bı tıfıngeki û bı sê gullan derket rê. Riya Play-Me bı xwina dıjmın sor bû...

Ko-Long kete 15 saliya xwe. Ew roj serok çar mayın (bombeyên bınê erdê) da wi û got:

— Riya te vekıri be!

Ko-Long bı rê ket. Ev rê nêzi sinorê Kamboçyayê bû. Lı vê derê bı qasi bist - sih kilometır dûz, bê dar û ber, û jı erdeki beyar dıhate derbasbûn. Ko-Long jı bo ku dı vi erdê dûz da gıreki bıbine, bı rojan geriya. Çûn û hatına erebeyên dıjmın raçav kır. Dawiyê da mayin dı gırê ku hılbıjartıbû da veşart û ser wan xweşık gırt. Lı ser rê astengiyên ku şıkê dıkşine bı ci kır. Paşê çû û lı ciki dûr, dı çaleki da xwe teland.

Wextê dengê motorên erebeyan jı dûr va hat bıhistın, dılê wi wek çûkeki pırpıti. Heşt kamyon lı dû hev rêz bûbûn û dıhatın. Wextê ku lı ser rê astengan ditın sekının, xwe jı kamyonan avêtın û berbı gır reviyan, lı wê derê ketın keminan. Jı wana du kes Emrikani bûn. Ko-Long; lı ber tıfıka oda gund şevên bê xewi ku bı guhdarikırına Apê Kot derbas bûbû dıfıkıri. Bı hemû qeweta xwe pêli pima mayinan kır. Teqandıneke ecêb çêbû. Gırê ku dıjmın lê star bûbû kaf û yekûn bû, toz û xweli û 50 cendekên dıjmın lı holê belav bû.

Jı wê rojê pêda ev rê jı leşkerê dıjmın ra bû wek pıreke cehnımê. Der û dora Çemê Piayê bı parçeyên kamyonên şewıtandi tıji bûbû. Dı Çemê Kle da cendekên Emrikaniya bı ser avê ketıbû.




Lı hemû der-dora wê hêlê behsa pêşmergên ku xwanê nedıkırın, dıbû. Dı payiza 1965'an da pêşmergên gundê Ko-Long hêzeki dıjmın şıkandın. Hêzeki dın yê dıjmın ji bı dû wan ket. Hêza dıjmın bı hejmara xwe gelek zêde û jı ali çek û silah va xurt bû. Serokê pêşmergan Thin, emrê paşvakışandınê da.

Hêzên pêşmerge berbı nivro gıhiştın gund. Apê Kot wextê ku Ko -Long dı nav wan da nedit, gelek acız bû. Bazda malê, rakır kevana xwe yê bı qundax û tirên bı jariya a-kam, derket lı dû Ko-Long geriya. Yên dın ji lı dû çûn.

Ko-Long, lı ser kaniya serê gund çok dabû û bırina gırmılkê xwe dışûşt.

— Jı bo ku reva me veşari bımine lı vê derê mam. Pır bûn, wê tıfıng kar nekıra. Mın xwe teland, heta ku çend metro nêzi mın bûn sekınim



û wê gavê mın bombeyê desta vırvırand bı ser wan da; şê dıjmın hate kuştın, yên dın reviyan.

Serokê komık, bırina Ko-Long gırêda û got:

– Mın emrê revê dabû, te nebıhist?

– Mın bıhist. Lê jı bo parastına dawiya me dıvê yek jı me bıma. Ez jıxwe bırindar bûbûm. Jı ber wê yekê mam. Bı wi halê xwe bı kêri tış-teki dınê nedıhatım. Lê hûn hê dıkarıbûn jı heqê gelek karan derên bo welatê me, bo gelê me.

Wextê, ku gotın tê ser vê meselê Apê Kot hêstırê çavên xwe nıkare bıgre. Yên ku lı oda gund, lı ber tıfıkê wi guhdari dıkırın bı rûmet, bı hezkırın dısekınin û lı pêşiya xwe dınıhêrtın. Lewra lı wi welati êdi tava bıserketınê peyda bûye û mırovên vi welati ji wek ronahiya tavê xweşıkın.

Ko-Long êdi pêşmerge nine. Jı saleki vırda dı Ordiya Rızgariya Vietnama Başûr da wek şer-vaneki pêşevan şer dıke. Dı daxwaznama xwe da, ku dıxwest beşdari Ordiya Rızgariyê bıbe, weha nıvisi bû.

*"Ez jı 14 saliya xwe vırda pêşmerge me. Mın jı Emrikaniyan û jı leşkerên Saygonê yên kırê-kırı 124 kes kuşt, heşt tanqan terıband. Jı ber ku emrê mın êdi mezıne, ez dıxwazım beşdari Ordiya Rızgariyê bıbım."*


Ko-Long lı ber Komcıvinê lı sıngê wi gulek, wek gelê me xort û bedew, bı şan û şeref, eni vekırı, serê wi bılınd, mêrxas û bêtırs e.



Sılav jı gelên zozanên jorin yên mêrxas û pa-yebılınd ra; sılav bo rızgariya welatê wi û mêr-xasan ra, ku jı bo serxwebûnê şer dıkın.

## JI NAV EDEBÎYATA CÎHANÊ

# İlya Ehrenburg



*İlya Ehrenburg, dı pıraniya xebatên xwe da, jı helbestvaneki zêdetır nûçegihaneki zirek û serfıraz e. Mırovşırovekırına Ehrenburg bêtır şematik û serrû ye. Ew bı teqin û lıvin (hereket) dıkare tabloyên rewş û pergala jiyanê pêşan bıde. Lê pır caran nermûş û motivên bıngehin yên serpêhati û romanên wi, bı hevkariya rengan, bı şêweki hêsan û bê navgin (indirek) tine ber çavan. Ew ne nıviskarê nuansên psikolojik e. Wek nıviskar û rojnamevaneki rastbin (realist), ew kêm cara hıssiyetê tevi şırovekırın û nıvisên xwe dıke.*

*Yek jı serpêhatiyên wi "Çermdarê Kal" nımûneyek e jı bo vê yekê. Dı vê serpêhatiyê da, Ehrenburg bı hostati, wêneyekê jı dema pêşiya şoreşa Oktobrê dıde. Me ew jı swêdi wergerande kurdi û lı jêrê pêşkêşi xwendevanan dıkın.* □□

*İlya EHRENBURG, dı sala 1891'i da lı bajarê Kiev hatiye dınyayê. Dı nav nıviskarên rûsi yên ku dı warê navnetewi da tên naskırın, şûna Ehrenburg lı rêza pêşin e. Jiyana wi bı gelek guherandın û bûyeran dewlemend e. Pışti xwendına xwe lı Moskovayê, ew tevi refên şoreşgeran bû. Jı ber xebatên xwe yên siyasi, gelek caran lı ser hev hate gırtın. Ehrenburg, lı welatên Ewrûpayê pır geriya û demeke dırêj lı Parisê jiyana xwe derbas kır. Lı wır wek nûçegihanê rojnama "İzvestiya" xebata xwe dıajot.*

*Ehrenburg, lı destpêkê wek helbestvan derkete ortê, lê paşê derbasi nıviskariya pexşenê (nesir) bû. Dı salên 1920'an da bı hejmareke bılınd, roman û serpêhatiyên wi hatın weşandın. Babetên gelek efrandınên wi lı ser jiyana Ewrûpa Rojava ne. Wextê Elmanan Paris dagırtın (işxal kırın) dı sala 1940'an da, Ehrenburg jı Parisê derket çû Moskovayê. Dı romana xwe "Ketına Parisê" da sedemên bınketına Fransızan analiz dıke.*

# ÇERMDARÊ KAL

wergerandın: Zınar Ala

Ev Şaxtel çı mırov e? Çavên bıjıqi jı ber bêhna postên bêhngeni. Ew çermdarek e yan belayeke incilê ye? Mırov hema weha lı rewşa wi dınêre... Bera (bı rasti) ki bala xwe dıde Şaxtel, ki lı rûyê wi dınêre? Jiyan jı xwe bı derd û kulan va dagırti ye. Xelk lı kumê serê Goroviç ê çerm dınêre, lı keçên bedew dınêre, yan ji lı derdê xwe dınêre. Kes lı Şaxtel nanêre. Hêstırkên çavên wi qet ranawestın. Lê ew ne hêstırkên xemê û dılşewatê, ne ji hêstırkên jı ber ken û kêfxweşiyê ne. Ew hêstırkên qapaxên çavên bı bırin ın. Şaxtel belengazek e. Û geleki ji bı tenê ye. Mırın, mirata mırınê Şaxtel jı bir kıriye. Û Şaxtel bı wan çermên rengin va hê ji mıjûl dıbe. Ew, wan veçê dıke, cila dıke û dı ber ra dırame.

Lı dervayi pencerê lıvina (hereket) rojê destpê kıriye. Nişan û uniform dıguherın, lı herderê plakat û kaxez. Lê tıştê ku Şaxtel lı ser dıfıkıre ne ew ın. Xudê ji dı bira wi da nine, herçend ji ew cıhûyeki (yahûdi) bı baweri ye, rojên piroz hertım piroz dıke û êvarên inê çıra Sebatê lı ser masa wi vêdıkeve, lê disan ji Xudê hiç dı hışê wi da

nine. Ew lı ser tıştıne heri hêsan (basit) dıfıkıre: Zıvıstan- weki roj kurt ın, havin- weki roj dırêj ın. Hış û aqılê wi tevlıhev e, wek gêjan.

Carna bıraziyê wi Mûça tê ba wi. Bibıkên çavên Mûça wek agır dıçûrısın û dı berika wi da karta Komsomolê heye. Mûça bı Şaxtel dıkene, tınazên xwe pê dıke.

— Ka bêje, çıma mırov dı Sebatê da spiyeki dıkuje ne kêçeki?

Şaxtel dengê xwe dernaxe, weha bı xem û keder çermê dı destê xwe da dıbrıqine. Ew bersiva wê pırsê nızane. Ew ne rabbiyeki (haham, keşiş) xwendi ye,tenê çermdareki basit e. Erê Mûça dıkare jı kesên zana bıpırse, lê Mûça her dom dıke:

— Xudayê te ji bı bêaqıli hatiye afrandın û wextê wi ji hat ku mırov êdi wek lambên neftê (qazyaxi, don) jı ortê hıline.

Şaxtel serdanpê Mûça raçav dıke û weha hıneki bı gazın û bêçare lê dınêre. Ew ji dıke ku wek wi rûyê xwe xweş bıke û pê ra bıkene – jı xwe lawık henekan dıke. Jı çavên wi hêstırkên badılhewa dıbarın û dıbarın. Bı dengeki nızım dıbêje:

— Tu çıma lı mın heqaret dıki Mûça? Ma qey Xudayê te yê nû geleki bı hış û aqıl hatiye afrandın? Ez nızanım. Ez êdi kal bûme, hışê mın ji têrê nake, ne wextê mın e ku ez wan kaxezên te bıxwinım û jê fam bıkım. Lê tu mıroveki baş i, herwısa Xudayê te ji Xudayeki baş e. Mın bı bêhışiya mın va bı tenê bıhêle. Bê baweriya Xudê, ez dê xwe wek sûcdareki mezın his bıkım. Bêje, ezê bı kê ra bıpeyvım wê çaxê? Bı wan belavokên te yên çapkıri ra? Yan bı vê kêra xwe ya bı xwin ra? Yan ji belki bı vê tenêbûna xwe ya malxırab ra? Lı halê mın bıfıkıre Mûça! Merhemet bıke! Tu bı xwe dıbêji, hemû dınya bı we ra ye. Ma gelo ez û mûma mın a Sebatê û ibadetên mın yên ecayib, ciyeki pır fıre dıgrın, dı wê dınyayê da?

Na, Mûça nıkare Şaxtel bine rê. Na, jı xwe ew ji welê zêde serê xwe pê naêşine. Ew bı tıştên gıring û cıddi va mıjûl dıbe - ew dıxwaze işê hemû dınyayê têxe ser riya qenc. Lê Şaxtel her lı ser iş û karê xwe berdewam e. Çerman berhev dıke û duayên xwe tekrar dıke.

Lı dervayi pencerê, ew bajarê bıçûk yê yahûdiyan dıkele. Û dı dawiyê da rojeke bagerê ya ne xweş hat. Jı berbanga sıbê teqe-reqa ereban e, tên û dıçın. Lı ber çeperan kesên cesûr lı hev cıviyane. Ew, gaziya wan hêzên sıpi yên cıwan dıxwinın. Şaxtel hiç gazi û dazanan naxwine. Ew lı malê jı xwe ra vala rûdınê - kes nayê tembi (sipariş) nake. Rûdınê û dırame: Êdi payiz hat, roj kurt dıbın... Şaxtel bêtaqet e û qet bı bûyer û tevlıheviya dor û derê xwe ra eleqeder nabe. Ew qet nafıkıre ka ew mırovanan çıra wısa bı telaş û bı heyecan ın, çıma teqe-reqa ereban e, diya Mûça çıra ax û wax dıke û jı halê xwe gazınan dıke. Na, ew qet nafıkıre, piremêrê qeşmer. Êşek ketiye hestiyê qorıkê û çavên wi jı hev venabın.

Tariya şevê hêdi hêdi xwe berdıde kuçe û kolanên cıhûyan, û baxçeyên wan yên xemgin. Lı kuçan apolet (nişanên sermıla) dıbrıqın, û qireqira wê pirejına ku sêvên pıjandi dıfroşe hatiye bırrin. Êdi tari ketiye nav wan baxçan. Şevê lez dıkır ku zûtırekê wê roja şıl û bı xunav bıfetısine. Dı dawiyê da şev bı serbesti tê. Hıngê dengê tepe-repa piyên mırovan tê bıhistın.

Çavê serketiyan bêperwa nın û dı wan da xem û nexweşi dıxuyê. Guharên wan hene û dengê wan ketiye. Dıkevıne hundurê malan, çı tıştıne rengin û tıştıne ne hêja ku tenê çavê wan pê têr dıbe, qûç-qû berhev dıkın. Bêi ku nefesgırtına xelkê ya bı heyecan û telaşa wan jı xwe ra bıkın xem, lı pêş çavên wan sandoqên wan dışkênın û talan dıkın. Ew dê bı naftalinê bıbêhnıjın. Bı balkêşi çavên xwe lı ser tıştên zivin, lı morê (muhurê) ser wan dıgerandın. Bı ditına çaydaneke huneri yan ji tıştên ku bı destan hatıne hûnandın ra, heyecanek bı wan dıgıre. Nıha odê terk dıkın weha bı tewreki sûcdar, jı xwe ne emin. Û dı boxçên destê wan da, desmal û pêşgirên rengin û neqışandi, vazoyên ziv xuya dıkın... Paşê maleke dın, û paşê ya sêwemin. Jı ber hêrsa xwe gêj bûne.

Êdi ku vazoyên ziv û desmalên rengin dıbinın rûyê xwe jı ser wan dıguhêzın. Çımki têra xwe gırtıne. Tu dıbêji belki ew agırên serê çiyan, nıha dı dılê wan da vêdıkeve. Ewana tola xwe jı wan kesên hejar û belengaz, jı laşên wan yên bêparastın, ku xwe dı holıkên mırişkan da vedışêrın, dıstinın. Heta lı bayê ji hêrs dıbın. Ew bayê ku vê şevê qet nasekıne. Mirata bayê!

Lê bıneciyên vi bajarê bıçûk?... Xelk dıke qêrin. Çıma? Bı qêrinê çı qazanca wan heye? Ew ji nızanın jı bo çı dıkın qêrin. Hema dıqirın. Qêrina ku jı qırıkeki derdıkeve, bı yên dın ji dıgre, ew qêrin bı xani ji dıkeve. Dı dawiyê da ne tenê mırovek dıqire - xani ji dıqire, ew avayiyê bılınd û

reş, mina sandoqeke jı kevır çêkıri, dı navbera tari û teqe-reqê da.

Dı destpêkê da ew jı ber vê qêrin û qajina xelkê şaş dıbın. Evana lı kê dıkın hawar û gazi? Tenê bayê gurr bı hoviti bersiv dıde: Herıne cehennemê! Mırın û cehennem! Lê pışti qaseki guhê wan êdi hini vê qêrinê dıbe. Jı bo wan ew qêrin û zarin dıbe parçeki vê şeva bêdawi. Vê şeva ku stêrk ciyên xwe dıguhêzın, gurme-gurm jı erdê tê, herweha gurmina topan, dûyê agıran, kêç û sıpi, derd û keder. Kengê ew malan terk dıkın, weha bı pozbılındi carekê xwe dadıweşının, paşê dımeşın. Deng jı xani nayê. Hemû xani bêdeng bûne, bı parsek û zenginên xwe va, bı wan dersdarên tewratê yên rûsıpi, xortên azadixwaz ku çend saet berê ser cıvinan qıse dıkırın.

Şaxtel dı xaniyeki xırabe yê karkeran da, lı qata here jorin dıji. Ev xani dûr e, lı Zarotjê û ancax serê sıbê ew têne mala Şaxtel. Qatên xani, yek lı dû yeki dıke qêrin û bêdeng dıbe. Lı oda kêleka oda Şaxtel, hostayên saetan Fucher dıke qêrin. Ew bona wan çılsalên xwe yên bı derd û kul û bona saetên muşteriyên xwe dıgri û dızare. Lê Şaxtel lı ber lambê rawestiya ye. Dua dıke. Ronahiya lamba wi kêm bûye pıri vêketiye. Hındık maye vemıre. Lê Şaxtel duan ezbere dızane. Pıte-pıta wi ye: "Mırın xweş û hêsan e lı pêşiya te"... Tu maneyeke wan gotınan nine, bêhna tozê, qeranfil û pirbûnê jê tê. Duayên rût ın.

Hingê serkevtiyek tê. Xorteki qeraseyi bêfam e, dı stûyê wi da du heb xaç. Ew ji wek vê şevê bı êş û xemgin e. Jı qestan piyên xwe hışk lı erdê dıxe û heta dıxwaze ku guharên guhê wi xweşık bıçırısın lı ber ronahiya lambê, lê bina wi çıkıyaye. Wek lamba Şaxtel ew ji bı zorê nefesê dıgre.

Dema çavên Şaxtel bı xencera wi ya bırıqandi dıkeve, paşda vedıkışe. Serçavê vi xortê êrişkar pıçeki roni dıbe, dema ku bı ken nêzi wi dıbe.

— Tu dıtırsi kûçık?...

Ew Şaxtel nas nake. Ew dıbê belki Şaxtel dıtırse û wê mina hemû wan kesên dın, xwe bavêje ser dest û piyên wi, lı ser çokan, jı bo canê xwe û zarokên xwe lava û rıca bıke. Cezayê xwe bıbine kûçık!... Ki dızane, dıbe ku kurê wi bûye, yê ku baxçê sıpi şewıtandiye, ku jı wır geleki dûr e, lı wi welatê ku roja wi tım bılınd e, ciyê genımê zer? Dı çavên wi yên bı dûman da şabûnakê ronahi dıda. Lê Şaxtel her xwe berbı pencerê dıkışand.

— Tu dıxwazi bırevi? Qet necerıbine!

Wê gavê dı serê Şaxtel da tenê fıkrek heye: dıvê xwe bıgihine ber pencerê. Jı xwe careki rev dı hışê wi da nine. Wê jı ber çı bıreve? Ma mırın jı wi emrê pir, dı nav postên bêhngeni da xırabtır e?Na,mırın xweştır û hêsantır e.Lê cıhûyeki kal çawan dıkare bı destên neşûşti bımre. Ewê çawan bıkarıbe destên xwe yên pis, bı gemara jiyanê va dırêji Xudê bıke. Ew qanûna hışk jı zarotiya wi heta nıha lı ser Şaxtel maye û nıha ayeta dawiyê dı bira wi da ye.

Ronahiya berbangê ya gewr xwe dı pencerê ra berdıde hundur. Ewran, asiman dagırtıne, ronahi kêm e lı vi bajarê talankıri ku xızani lê hukum dıke.

Pencere bı xunav e. Çend dılopên avê hêdihêdi lı ser camê tên xwarê. Rengê dılopan gewr e, wek hemû rengên dın, dı vê saetê da. Şaxtel paşopê berbı pencerê dıçe. Dıxwaze pêwistiya xwe ya dawin bı cih bine. Tiqe-tiqa xortê serketi ye bı wi dıkene. Ev serseriyê pir dıxwaze pencerê veke û jı derva hawarê bıxwaze, tê bêji qey hın kes wê bên û wi rızgar bıkın. Lı jêrê hevalên serketi yên bı mırûz, laş, zıbıl, pûrta balgifan, parçên neynıkên şıkesti - hemû berhemên vê şeva pêşin.

Dema Şaxtel nêzi pencerê dıbe, kefa destê xwe lı ser cama şıl dıgerine û paşê destên xwe bı hev mız dıde. Daxwaza xwe tine ci - ew êdi dıkarê desteki paqış dırêji Xwedê bıke. Û Şaxtel bı kubari dıbêje:

— Mın destên xwe şûşt, nıha tu dıkari mın bıkuji. Jı nışkava serçavê lawık jı hêrsan reş bû, agır jı ber çavên wi dıpeke.

— Şeytan! Ew careki namrın!... Pêşiyê gereke ew bı xwe belengazeki bı êşkence bıkujın paşê!

Bı wê hêrsa xwe darê tıfıngê bılınd dıke û lı serê kalê dıxe. Şaxtel derhal dıkeve, pıçeki dıpırpıte û wek sandalyeki bêcan lı erdê dımine. Lê hêrsa mırdar (qatıl) danakeve. Tıfınga destê xwe dıfırine davêje û wek dinan, bı lez jı merdewanan peya dıbe dıçe jêrê.Hevalê wi lı ser sandoqeki rûnıştiye,bawişk têne û cıgareki dıpêçe.

— Ew piremêrê şeytan... Destên xwe lı ser cama pencerê dıgerand û pêra ji dıkeniya... Ez êdi hew dıkarım tehamul bıkım! Mırovên weha lanetkıri nahêlın mırov biji.

Hevalê wi bêdeng guhdariya wi dıke. Tenê bawişk têne û wek kûçıkeki lı ber diwar bı dengeki dıke kûzin. Û serketi jı wır bazdıde, dıkeve nav kolanên dırêj û wında dıbe.

# Pêkeni

## DISEKINE, DISEKINE...

Rojeki lı rojên havinê xeberek xırab lı nav gund da belav dıbe. Hemû gundi pê dıhesın, ku listeyek nû lı ber qereqolê hatiye dalıqandın. Gundi hemû jı hevudu dıpırsın: "Navê kurê mın tê da heye? Navê mêrê mın tê da heye? Gelo, navê bırayê mın tê da heye?" Êdi destê gundiyan xebat nagre. Tırsek mezın ketiye nav wan.

Liste ne lista "terorist û bolucu"yan e. Lista deyndaran e. Gundiyên belengaz bıxwe ji nızanın ev çı deyne bûye bela serê wan. Dıkın nakın jı vi deynê pak nabın. Ev deyn, deyneki wılo ye ku tucar xelas nabe. Gundi jı wextê bav û kalan vırda dıdın nadın ev deyn tucar xelas nabe.

Wek tê zanin xebera reş zû belav dıbe. Dawiya dawi xeber dıgıhêje Xalê Evdo ji. Çawa dıbize çongên wi dışkên. Êdi nıkare jı ber xwe rabe.

Xalê Evdo, gundiyeki pır xızan e, zeviyek wi tenê heye. Lawê wi Mıho, sal û wext dıxebıte, ku nanê malê derxe. Pır caran dernaxe ji. Destek tenê heye lı malê, nıha hukumeta Tırk wi ji dıxwaze. Çıqas nıfır û xeberên xırab tên bira xalê Mıho jı hukumeta Tırkan ra dıbêje.

Xalê Evdo, radıbe dıçe qereqolê. Halê xwe bıbêje. Kes guh nade pê. Çawişê qereqolê bang lı Xalo dıke û jêra dıbêje: "İmkan tune ye, ev deyn deynê welat e, gerek em hemû herın vi deyni bıdın." Xalo bo vê bersivê hêrs dıbe dıke ku bıteqe û jı xwe ra dıbêje; "Ez lı deynê we û hukumeta we, ordiya we......ım."

Mıho, zad lı zeviyê dıhêle û dıçe qereqolê. Çawişê Tırkan, nutuqeke dırêj dıkşine jı xortan ra; "xızmeta eskeriyê xızmeta welat e, xızmeta welat, xızmeta namûsê ye" û hınek nesihetan dıgrın; "jı xwe ra Tırki hin bın! Tırki zımanê mırovan e, ne zımanê heywana ye..."

Gelek xort jı ber gotınên çawiş hêrs dıbın. Dıkın ku ber xwe bıteqın. Nav xwe da dıfıkırın; "ma gelo qey em ne merıvın? Jı ber ku em Tırki nızanın jı bo wi me mırov nahesıbinın? Lı vê dınyayê ewqas mırov hene û pıraniya wan Tırki nızanın, ma qey hemû ne mırov ın?"

Lawê Xalê Evdo, Mıho, nav xortan da dengê xwe bılınd dıke; "Komûtanım ben tırki ogrenecek!"

Pışti wê rojê xortên gund, yên ku emrê wan gıhiştiye 20 sali hemû bı rê dıkevın. Her yek jı gundê xwe dûr dıkeve. Jı welatê xwe dûr dıkevın, nav welatên Tırkan da belav dıbın.

Bı vi awayi roj derbas dıbın, meh derbas dıbın, 20 meh tıje dıbe. Bı çoyê zorê deynê welat jı xortan tê stendın. Nav bist mehan da, şirê ku jı diya xwe mêtıne, jı pozên xortan tinın der. Dawiya dawi jı vê belayê ji xelas dıbın û vedıgerın ciyê bav û kalê xwe.

Mıho jı eskeriya xwe bı xêr û selamet dıqedine û tê gund. Çawişê Tırkan hin nehatiye guhartın. Eger guhartınek çê bûye ji, bı sıtûyê çawiş bûye. Çawişê Tırkan 20 mehan da ewqas bertil û malê gundiyan xwariye, ku mırov dıbê qey ev ne merıv e, beraz e.

Çawiş çawa xebera Mıho dıbize, gundiyan lı meydanê top dıke. Lı ber gundiyan jı Mıho pırs dıke:

– Mıho! beri ku tu bıçi eskeriyê te sozek dabû mın! Tê bira te?

– Erê qomıtanê mın. Ez Tırki hin bûme. Wek bılbılan Tırki xeber dıdım. Ez bûme merıv.

– Ez jı te bawer nakım. Ka jı mın ra bêje? Navê vi tışti çi ye?

– Araba, qomûtanê mın.

– Navê vê darê çi ye?

– Çam, qomûtanê mın

– Navê vê heywanê bıçûk çi ye?

Mıho dıke nake nıkare bersiva dawi bıde. Dıfıkıre nafıkıre, tırki da navê "berxık" nayê bira wi. Çawiş disa pırs dıke û tınazê xwe bı Mıho dıke:

– Ka Mıho te Tırki zanıbû, te wek bılbılan xeber dıda.


– Hat bira mın qomûtanê mın. Ez dızanım jı wi heywanê ra dıbêjın çı. Ev heywan wextê ku dıbe navê wê tune ye. Dısekıne, dısekıne, mezın dıbe, wê demê jı wê heywanê ra dıbêjın Koyun (Pez).

5.8.1987

HEVAL



# ZAROK



## ÇIVİK

**TOLSTOY**

*Wergerandın jı tırki: X. LEZGİN*

Seryoza dı roja sersala bûyina xwe da gelek yadigarên hêja wergırt, vızık, bûkeşûşe, hespên rındık, wêne û gelek tıştên dın.

Yadigara here rınd û delal, jı apê xwe gırt: Jı bo nêçira çıvikan dafıkek. Çarçovek û texteki wê yê bıçûk hebû. Bı aliyeki textê va ji torek gırêdayi bû. Mırov lı ser texte hınek qût dıreşand, û ew datani hewşê. Dema çıvik çawa dıhat lı ser texte datani, texte ters dızvıri, çıvik dıkete hundurê torê.

Seryoza wısa şa dıbû ku êdi nedıhate gotın: Çıma ku yadigareke wısa baş wergırtıbû. Hema zûkava çû cem diya xwe ku tora xwe nişani wê bıde.

"Ev ne yadigareke başe" got diya wi. "Tê çıvikê bıgri çı bıki pê? Tu dıxwazi lı çıvikan eziyet bıki, ma çı dıkeve destê te?" got...

"Na, ez çıma lı çıvikan eziyet bıkım. Ez wan naêşinım. Ezê çıvikê bıgrım û têxme hundurê qefesê. Qûtê wê, ava wê bıdımê. Ew ji bıla bıxwine."

Seryoza çû, ceh û genım dit, ani dani ser texte, dafık dani hewşê. Sekıni, sekıni, sekıni tu çıvikek ji nehat û daneyni ser dafıkê. Ma çıvik tê?

Seryoza lı wır, lı ber dafıkê çık rawestiyaye. Jı wi dıtırsiyan çıvik. Loma nêziki dafıkê ne dıbûn.

Seryoza ku bırçi bû jı dafıkê dûrket çû malê xwarınê bıxwe.

Lı vegerinê dit ku çıvikek dı nav torê da glomik dızvıre. Seryoza lê bû bıfırıya jı şabûna; çawan çıvik gırt wısa bı lez ew bıre malê.

"Dayê, dayê! Bınêre! Mın çıvikek gırt; dıbe ku bılbıl be ji. Dılê wê çawan gum-gum lêdıxe!'

"Bılbılê çı? ev çıvik e kuro!" got diya wi. "Canê çıvikê neêşini. Yan ji hema ya baş ew e tu wê azad berdi."

"Lêê! Çıma? ezê qût bıdıme wê, avê bıdıme wê".

Seryoza çıvik xıste hundurê qefeseki. Av dani pêşiya wê, qût dani. Wê rojê qefes paqıj kır. Roja dın disa wısa. Lê roja 3'a Seryoza çıvik jıbir kır. Ava wê ji neguhart.

"İcar te dit? bınêre te çawan çıvika xwe jıbir kır." got diya wi, "çêtır e ku tu wê azad bıki bıla bıfıre here."

"Na, ez careke dın jıbir nakım. Ez hema nıha ava wê dıguhêrım. Qefesê ji paqıj dıkım."

Çıvika belengaz jı tırsan xwe bılınd dıkır, çep-rast lı dorwarên qefesê dıxıst. Seryoza ji destê xwe dırêji hundurê qefesê kır, destpê kır paqıj kır.

Pışti paqıjkırınê çû jê ra avê bine. Jıbir kırıbû ku devê qefesê bıgre. Diya wi dit ku qefes vekıri ye. Gazi Seryoza kır:

"Devê qefesê bıgre Seryoza! Çıvik wê derkeve, ciheki xwe bıêşine."

Diya wi hêj gotına xwe ne qedandıbû, çıvikê deriyê qefesê dit, Bı şabûnekê baskên xwe çırp çırp çırpand., jı qefesê derket. Baskên xwe yên bıçûk şıdand, wek tir jı kevanê derkeve, berbı pencerê fıriya. Jı kuderê bızanıbe ku camên pencerê hene, gumm xwe lı camê xıst.

Seryoza bı lez çû ew jı erdê hılda, disa dani hundurê qefesê. Çıvik hela hê nemırıbû. Lê lı ser sıngê xwe ketıbû û baskên xwe fıre berdabû.

Seryoza lı vê rewşê nêri nêri û kelogırı bû.

"Dayê ez çı bıkım nıha?"

"Qet. Tu wê çı bıki?"

Wê rojê Seryoza heta êvarê jı qefesê dûrneket. Çavê xwe jı çıvikê ne qetand.

Çıvikê hin zû zû binefışk lêdıxıst.

Seryoza çû ku rakeve, wê demê çıvik dıjiya. Demeke dırêj xew nekete çavên Seryoza. Çımki dema ku çavên xwe dıgırt, çıvika bırindar dıhate hışê wi.


Seryoza serê sıbê rabû çû ba qefesê. Nêri: Çıvik serpıştki dırêjkıri bû. Cendekê wê yê bıçûk hışk bûbû, lıngên xwe kışandıbû ber xwe.

Jı wê rojê şunda gırtına çıvikan!

Careke dın çıvikan bıgre têxe qefesê! Tışteki wısa êdi dı hışê wi ra derbaz nedıbû.

□

## XAÇEPIRS



# JI NAV WEŞANAN

## DU FERHENGÊN KURDİ:

### FERHENGA KURDİ-TIRKİ, TIRKİ-KURDİ

Jı ali Komeley Xwendıkarani Kurd Le Ewrûpa va "Ferhenga Kurdi-Tırki Tırki-Kurdi hate weşandın.

Ferheng jı aliyê D.İzoli va hatiye amedekırın. Ferheng jı du beşan pêk tê (Kurdi-Tırki, Tırki-Kurdi) . Dı derheqa amadekırına vê ferhengê da nıviskar bı xwe agahdariyê dıde û waha dıbêje:

"Xebata mın lı ser vê pırtûkê gelek dırêj e. Ta sala 1962 dıçe. Mela Evdılkerim Sılivi zarê Kurdi dı dılê mın de germ kırı bû. Bıryareke rasti jı dıl, 8 sal berê hat.

Ez kırêkareki fabriqê lı derveyi welêt, mın lı xwe isbat kır ku; lı êvaran, serê heftê, dema valahiyê, her car çend rûpel bêne nıvisandın, mırov pırtûkeki wısa pêk tine. Gava bêjım: "naveroka vê 20 000 bêje, 4000 bıwêjên Kurdi û nêzi 12 000 bêje yên beşi Tırki; legel lêkolin lı ser dûgelên dınyayê û rêzmani, gıringiya vê xebatê berçav dıbe..."

• • •

### FERHENGA ZAZAKİ-TIRKİ

Cara yekem e ku bı zazaki ferhengek tê weşandın. Wek tê zanin, zımanê kurdi jı çar şiweyan pêk tê. Zazaki (yan ji dımılki) yek jı wan e. Ev şêwe bı taybeti lı çend hêlên Kurdıstana Tırkiyê tê axaftın. Heta nıha bı zazaki efrandınên nıvisandi pır kêm peyda bûne.Jı ber vê yekê astengiyên lı ber xebateke weha lı ber çav e. Wek ku nıviskarê ferhengê ji dıde xuyakırın, ev ferheng, jı bo şiweya zazaki xebateke destpêkê ye. Ferheng bı zazaki-tırki ye û 431 rûpel e.

Ferheng jı aliyê Malmısanıj va hatiye amadekırın û dı nav Weşanên Jina Nû da hatiye weşandın.

## PIRTÛKA KEREMÊ REŞ A NUH DERKET



Van dawiya weşanxana Moskovayê "Sovêtskêy Pisatel", pırtûka nıviskarê kurd Keremê REŞ, bı sernıvisara " Parad " bı zımanê rûsi çap kır

Beri ku em nasiya xwe bıdıne naveroka efrandınêd vê pırtûkê, em dıxwazın bı kurti we wi û xebata wi ra bıkıne nas.

Keremê Reş gelek salan bûye bıngevan û serokê koma bajarê Navosibirskêy şûrkêşiyê ê "Viktoria" yê navdar, dı gelek rojname û kovarên Sovyetistanê da bendên wi hatıne çapkırın. Ew nıviskar-tevgeleki televizyona Moskovayê "Qanalê 12-a" ye. Ew hostê sportê ye, rojnamevan û nıviskareki bı nav û deng e, laurêatê leca Sovyetistanê ya literaturi, lı ser navê Nikolay Ostroviski ye, nıha lı bajarê Moskovayê dıji û dıxebıte. Bı xebatên xwe va navê gelê xwe bılınd dıke, nasiya xwendevanên Yekitiya Sovyet dıde gelê xwe û diroka wi.

Kerem bı xwe jı gundeki kurdan—Heko (lı Ermenistanê) jı diya xwe bûye. Dema xwe da ew bı kurdzaniyê va mıjûl bûye, lı Universitêta Leningradê, ber destê akademikê mezın H. Orbeli hin bûye. Çend mıqalên wi yên derheqa kurdzaniyê, gelê xwe û mêrxwasiya wi da nıvisiye.

Pırtûka "Parad" 500 rûpel e û bı tiraja 100 hezar lıbi ronahi ditiye. Sê romanok çap bûne: "Lec", "Julan" û "Parad" . Ev pırtûka wi ya sısiyan e, ku lı Moskovayê, bı zımanê rûsi tê weşandın. Ew dı van pırtûkan da lı gelek ciyan qala kurda ji dıke.

Ki ku dıxwaze derheqa Keremê reş da, bı hûrgıli pê bıhese, gotareke mın derheq wi da, dı kovara "Hêvi" da çap bûye.

Têmûrê Xelil MÛRADOV
Endamê Yekıtiya Rojnamevanên Sovyetistanê

**ZEYNELABİDİN KAYA**
**"İŞKENCEDE 178 GÜN**
**(Dı êşkencê da 178 roj)**

Dı vê pırtûkê da nıviskarê wê, welatparêzê Kurd Zeynelabıdin Kaya, rojên xwe yên êşkencê dı gırtixana Diyarbekırê da, tine zıman. Serhatiyên nıviskar tenê parçeki zulm û hovitiya Nazistên Tırk e. Bê şık jı her ali va behskırın û şırovekırına gırtixana Diyarbekrê ne hêsan e. Lê dı vê babetê da ev pırtûk belgeyeke gıring e. Ew çawan tırs û bı tırsê ra ji hovitiya dıjmın lı ber çavan radıxe û wısan ji mêrxasi û berxwedana welatparêzên Kurd dıke belge.

Pırtûk lı Elmanya Federal, dı nav Weşanên KOMKAR da hatiye weşandın.Wek jı sernavê wê ji diyar e, zımanê pırtûkê tırki ye.

**NÛRİ ELİ EMİN**
**" ERK Û ŞONİ RANEWE KESİYEKAN LE AXAWTINİ KURDİDA**
**1986,304 rûpel.**

**DR. EWRIHMANİ HACİ MARÛF**
**"RÊZIMANİ"**
**Morfolojiy zımanê kurdi. Cild 1**
**Bexda 1987, 306 rûpel.**

**TOSINÊ REŞİD**
**"NİVRO"**
**Berevoka helbestvanê kurd Tosınê Reşid, bı sernavê "Nivro" lı Erivanê hate weşandın.**

# "DENGÊ KOMKAR"

## GIHİŞTE HEJMARA 100'İ



Organa Federasyona Komelên Karkerên Kurdistan lı Elmanya Federal (KOMKAR), Dengê KOMKAR gıhişte hejmara 100'i. Wê jı sala 1979'an heta nıha, jiyaneke weşanê ya têkoşer û serfıraz ajot. 100 hejmar... Dı hoyên iroyin da ev ne hejmareke hındık e. Dengê KOMKAR bı têkoşin û zirekiya rêxıstıniva dagırti ye.

Dı dema iro da ku dıjmınên gelê Kurd bı her awayi êrışi gelê me dıke û dıxwaze tevgêra wi ya azadiyê bıfetısine, derketın û belavbûna weşanên kurdi xwedi ehemiyeteke mezın e. Xasma rojnameyeke wek Dengê KOMKAR, bı istıkrar, bı naverokeke tıji û bı ditınên rastbin... Wê heta nıha pıştgıriyeke hêja daye tevgêra azadiya gelê kurd. Ew bûye dengê karker, xwendekar û ronakbirên kurd lı dervayi welat. Daxwaz û dıjwariyên zehmetkêşên kurd bı çaveki rastbin aniye zıman. Ew herweha jı bo zıman û çanda gelê me yê bındest bûye xwendıngeheke baş.

Hejmara 100'i lı gelê me û lı rojnamevaniya kurdi piroz be. Em jı dengê KOMRAR ra jiyaneke dırêjtır û xebateke xurttır daxwaz dıkın.

**REDAKSİYONA ROJA NÛ**



**BIHA: 10:– kr.**